

Bidestveanîna mafen neteweyî
yê gelê Kurd di çarçoveya
Îranek Demokratik û Federalî de

Hejmar: 22
Augusta 2005
Biha: 150 Tûmen

Rojnameyeke mehane ya siyasi û çandî



Peyama Sekreterê Giştî yê
PDK Îranê di rê û resma
bîranîna 60 saliya
avakirina Partiyê de

Rûpela 5 -8



Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

60 SAL XEBAT NE HINDIK E, LÊ JI BO AZADIYÊ NIRXEKÎ BIÇÜK

E60'mîn salvegera avakirina Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê hate pîroz kîrin

Rûpela 4



Daxuyaniya Komîteya Navendî ya PDK
Îranê derheq

**Şêstemîn sala avakirina
Partiya Demokrat ya
Kurdistana Îranê**

Rûpela 2-4



60 SAL XEBAT DI RÊYA AZADIYÊ DE



Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê

25'ê Gelawêja 1324 – 25'ê Gelawêja 1384

**Pîrozkirina cejna 25'ê Gelawêjê
li bajarê Kurdistana Îranê**


Bi boneya 25'ê Gelawêja ûsal, 60'mîn
salvegera avakirina PDK Îranê, li piraniya
bajar û gundên Kurdistana Îranê bi cozeke
germ û bêwêne ev cejna hate pîroz kîrin.

Li Urmîyê, Selmasê, Şinoyê, Piranşarê,
Serdestê, Mehabadê, Rebetê, Bane,
Seqizê, Merîwanê, Kamyaranê, Dîwandere,
Sine, Kırmaşanê, İlamê û gelek bajar û
cîhîn din karê propagandayê bi piştgirî ji
tevgera gelê Kurd li Kurdistan Îranê bi
pêşengîya PDK Îranê hate meşandin.

**Pîrozkirina cejna 25'ê Gelawêjê li
welatênen derve**

Herwiha li piraniya welatênen derve, ji
allyê Komîteyê çeleng yên PDK Îranê va
Amerika, Kanada, welatênen Ewropa û
Ustiraliyayê cejna 60 saliya avakirina PDK
Îranê bi cozeke germ hate lidarxistin.

Navenda 3'ê ya Kurdistanê jî roja 25'ê
Gelawêjê rê û resmeke hêja û berfireh
lidarxist û ew cejne hate pîroz kîrin.



**Nameya birêz
Mistefa Hicrî ji bo
Kofi Enan**

Rûpela 9



**Nameya birêz Mistefa
Hicrî ji bo Yekîtiya
Ewropayê**

Rûpela 10



Daxuyanî:

Şêstemîn sala avakirina Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê

Hevwelatiyên birêz!

Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!

Dost, alîgir û endamên Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê!

Roja 25'ê Gelawêja 1384'ê Rojî, rêkevta 16.08.2005'ê Zayînî, şest salêñ tewaw bi ser damezrandina Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê, Partiya pêşeng û xebatkar ya gelê Kurd di Kurdistana Îranê de derbaz dibe. Bi vê hincetê ve em pîrozbahiyêñ germ ji hemû endam, alîgir û dostên Partiyê, malbatêñ serbilind yên şehîdan, girtiyêñ siyasi yên berxweder û malbatêñ wan yên çavnihêr û tevahiya tex û qatêñ civaka Kurdevarî û hemû azadîxwazêñ Îranê dikin. Em ji bo xebatkarêñ rêya rizgarî û serbestiyê serkevtinê û ji bo hêvî û armancêñ niştimanî û neteweyî yên wan bidestveanîna herçiqas zû bi hêvî dixwazin.

Di 25'ê Gelawêja 1324(1945)'an de ji bo bersivdan bi hewcehiyêñ dîrokî yên qonaxa wê demê ya xebata rizgarîxwazane ya gelê Kurd, Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li ser bingeha rêxistinî ya Komeleya Vejiyana Kurdistanê (J- K) hate ava kirin.ku 3 salan berê bi mifah standin ji wê rewşa ku di encama şerê cîhanî yên duyem de pêk hatibû, ava bibû. Avabûna Partiya Demokrat guhertineke dîrokî di tevgera rizgarîxwazane ya neteweya Kurd de bû. Bo cara yekemin bû ku partieneke neteweyî- Demokrat bi bername û destûreke siyasi û civakî ya pêşkevtinxwazane dihate nav meydana xebata xelkê Kurdistanê û tevlî karwanê pir serfirazi ya xebatkarêñ rêya dadperwerî û demokrasiyê di herêmê de dibû parek ji xebata gelên cîhanê dijî Faşîzm, Nazîm, zor û zordariyê di hemû şewaz û çarçoveyan de.

Ji wê demê hetanî niha PDK Îranê alahilgirê xebata xelkê Kurdistana Îranê û yek ji hêzên sereke û xwedî hitbar yên nava tevgera rizgarîxwaz ya neteweya Kurd e. Ji bo vê partiyê di dîroka pir serfirazi ya tekoşîna xwe de gelek kosp û asteng û evraz û nişîvîn zaf hatine holê, tûşî têkşikan û tengasiyan bûye, rojêñ giran û dijwar ceribandine, bêguman tûşî şâşî û

kêmasiyen jî bûye, lê tu car bo rojek ji rojan ala xebatê bernedaye û di her qonaxekekê de rêya jêhatî ji bo domandina rîbaza xwe peyda kiriye. Vê partiyê di jiyanâ xwe ya siyasi de serkevtinê mezin û berbiçav jî ji xwe re tomar kirine ku li sereweyî hemûyan de avakirina Komara Kurdistanê ye ku tenê 159 rojan pişti avabûna partiyê pêk hat.



Partiya Demokrat ne bi serkevtinan qude bûye û ne jî bi têkçûnan bê hêvî bûye. Ji sernekevtinê xwe wekî pirekê ber bi serkevtinê pitir mifah standiye û ji serkevtinê xwe ceribîn bidestve anîne.

Biwêri û netirsîya wê çendê hebûye şâşî û kêmasiyen xwe bibîne û ifde bi wan bike û hewl û xebatê ji bo serrastkirina wan bide. Ji vê rîyê ve vê partiyê kariye wekî partieneke xwendî pirensip xwe bi dost û dijminan bide nasandin û her ew taybetmendiyane û xisletane jî ev partieneke kirine yek partiyê ceribî, biezmûntirîn û heta pir dîroktrîn hêza siyasi ya nav tevgera mafxwazane ya neteweya Kurd.

Xebatkarêñ rêya rizgariyê!

Heke em bixwazin xuyatîrin xisleten PDK Îranê bibîr bînin, em dikarin di nava dehan xislet û taybetmendiyen resen yên xebatkarane de, van xisletane wekî mînak bidin xuya kirin:

Ev partieneke ji kûrahiya civaka Kurdevarî serî hildaye, ji bo qazanc û xizmetkirin bi xelkê Kurdistanê jiyyaye û bizav kiriye û dirûşm û

armancêñ xwe ji xwestek û daxwazêñ wî xelkî bijartine. Her di wê demê de xwe bi tex û qateke taybetî ya civaka Kurdistanê ve girênedaye û hewl daye hêvî û armancêñ hemû çîn û texêñ gelî û demokratik yên civaka Kurdevarî di bername û destûra xwe de bi cî bike. Her ji ber vê çendê ye ji ku hemû ev çîn û texane bidestveanîna daxwazêñ xwe di cî bi cîbûna bernameya siyasi ya vê Partiyê de dîtiye, ji ber vê çendê piraniya zaf ya wan di bin ala xebat û tekoşîna vê partiyê hev girtine. Partiya Demokrat, partieneke rastbîn bûye. Dirûşmên xwe li gorî rewşa siyasi, civakî, rastiyen serdem û derdora xwe anîne rojevê û çi demekê hewl nedaye ku bala xelkê bo aliye dirûşmên ne bi cî rabikişîne û hilgire. Lewre jî qet nebûye endam û alîgirê wê li ser nerastbûna dirûşmên wê jê veqetin û lê dûr bikevin. Ji bo selimandina vê gotinê ev çende bes e ku dirûşma stratêjik ya PDK Îranê ku ji çareserkirina pirsgirêka Kurd di çarçoveya Îranê de (ci bi awayê Otonomiye yan Federaliyê) pêk tê, dirûşma piraniya herî zaf ya civatêñ xelkê û cihê pesend û pejirandina hemû Kom û Komeleyen siyasi ye û derbazbûna 60 salan hîmîn wê nelerizaniye.

Cihê baldanê ye ku Partiya Demokrat tevî bûna van dirûşmên stratêjik ji, tu demekê ji vê çendê bê xeber nebûye ku bi xwe parek ji tevgera Kurd e û gelê Kurd li ûrîne pişkek ji neteweya Kurd e û axa Kurdistana Îranê parek ji cih û warê bav û kalêñ neteweya Kurd e.

Partiya me bi têgihîştina hemû van rastiyane hewl daye her demekê him tevî hêzên siyasi yên opozîsyona Demokrat ya Îranê û him jî tevî hêzên siyasi yên xebatkarêñ nav tevgera Kurd baştirîn têkiliyê û alîkariyê ava bike. Bi wateyeke dinê Partiya Demokrat her di wê demê de ku Kurdistana Îranê bi meydana xebat û tekoşîna xwe ya siyasi hesibandiye û maytêkirin di kar û barêñ ci parêñ din yên Kurdistanê nekiriye, bi bawer ve pişte daxwazêñ rewa û berheq yên parçeyen dine Kurdistanê girtiye û tu derfetek bo piştgirî ji xebatkarêñ wa'şanê ji dest nedaye.

Xisletek xuya ya din ya PDK Îranê pêbendbûn bi serxwebûna siyasi û serxwebûna birtyargirtinê ye. Partiyê bi mafê rewa û heta hewce yê xwe zanî ye ku tevî gelek ji partî, rêtixtin, kom û komele û heya dewletan di dever û cihanê de peywendiya siyasi û diplomatik bigre û li ser dîtin û nérin û heta berjewendiyên hevbeş bi wan re alîkariyê bike. Lî di çi dem û çaxekê de bi ci qîmetekê dest ji serxwebûna xwe ya siyasi ber nedaye û eva ku bûye bingeha rîbaz û birtyarê siyasi ya vê partiyê tenê û tenê qazanc û berjewendiyên gelê Kurd û tevgera Kurd di Îranê de bûye ne tu tiştekî din. Li vir de bi şanazî û serbilindî ve em dikarin bibêjin zaf caran rê ketiye ku ji bo qazancê stratêjik yê tevgera Kurd Partiya Demokrat dest ji hin destkevtêne xwe yê demkî berdaye. Lî eva tu demekê teví serxwebûna siyasi ya partiyê nateba nine û di rastî de eva jî parastina qazancê dom dirêj yê Partiyê bi qîmeta çavniqandin ji bidestxistiyên demkî û kurtdem e.

Amadebûn ji bo dayîna nirx û buhayên azadiyê yek ji xisleten xuya yêne Partiya Demokrat e. Xebatkarên vê Partiyê evîndarên jîyanê ne, ne evîndarê şehîdbûnê. Lî vê demê ku hewce ye di rîya jîyanâ serbilindaneyâ gel de kesek dest ji jîyanâ xwe ya taybetî ber bide, xebatkarê demokrat ji cangorîkirin û fidakariyê tirsekê nabene ber dilê xwe.

Mêzeyî karwanê şehîdên vê partiyê bikin, di nav dehan hezar dost û tagirêne partiyê de, hezaran endam û sedan kadroyên xebatkar û dehan endamên Rêberiyê û li serweyî tevan ve em ser karwanê şehîdan **Qazi Mihemed** û serdarê şehîd yê navdarê Kurd **Dr. Qasimlo** û xebatkarê mandînenas wekî **Dr. Şerefkendî** dibînin.

Hemû ev xisletane û zaf taybetmendiyên şoreşvanî yêne din hitbareke xasmanî ji bo PDK Îranê çê kirine. Şest sal e ev partiyê rîxuyaker, rîber, Partiya xweştivî û cihê hêviya civatên xelkê Kurdistana Îranê ye. Him dijmin û him neyarên Partiyê gelek hewil dane ku ji hitbar û nifûza vê Partiyê kêm bikin. Lî hemû ev hewl û bizavane bi ne serkevtinê re rû bi rû bûne. Em piştrast in hetanî çaxekê ku xebatkarê vê Partiyê bi pirensîpêne wê wefadar bibin, ev dê her wekî berê cihê hitbara piraniya zaf ya xelkê Kurdistana bibe.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û rêtixtinê siyasi yêne Îranî û di nava xelkê parçeyên din yêne Kurdistanê û partiyên wan yêne siyasi de û di nava kom û komeleyên siyasi yêne deverê û navneteweyî de jî hitbar û nav û dengeke xuya û berçav heye û ew hemû ji wê wekî Partiyekê berpirsiyar, şoreşger, rastbin û bi pirensîp nas dikin û rîz û rûmeta wê digrin. Em dikarin bi aşkira bibêjin ku Partiya Demokrat di hemû van warane de di refa pêşin ya hêzên siyasiye Îranî û Kurdistanî de ye ku cihê dilxweşî û şanaziyê ye.

Hogirêne azadî, demokrasî û dadperweriyê!

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê di rewseke nû û hêvîdar de cejna 60'mîn salvegera avakirina xwe pîroz dike ku di deverê de guhertinê berbiçav û mezin derketine holê. Pirojeya **Rojhilata**

Navîn ya Mezin bi ißtikara Dewletên Yekbûyî yêne Amerîkayê û piştgiriya welatan û hêzên mezin dirûşmîn pêşvebirina demokrasiyê, parastina mafêni mirovan, gesandina abori, dijberî teví rejîmîn dîktator, bidestveanîna mafêni jinan û ji holêrakirina terorîzmî bilind kirine. Di hundirê Îranê de tev perdeyên xapandinê û fend û fêlîn li ser rûcîkê desthilata hakim hatine rakirin û kakil û naveroka wê ya kevneprestane wekî heye yê ketiye ber çavê hemûyan. Civatên xelkê Îranê hemû gumanek derbarê guhertina Komara İslâmî di hundir de danîne qiraxê û aşkira û bêperde di fikra vê çendê de ne ku hikûmetekî gelî û demokratik di cihê Komara İslâmî de damezrînin. Bi keyfxweşî ve xelkê Kurdistana ku tu demekê hember rejîmâ desthilatdar tûşî gumanê nebûne û ji destpêka avabûne ve rîya xwe ji rejîmê vejetandine, serhildaneke berfireh bi pêşwaziya cejna 60 saliya avakirina Partiya xwe ya xweştivî cûn. Eva pênc heftî ye Kurdistana Îranê bûye meydana rikeberiya ronahî û tarîtiyê, heq û neheqiyê, azadîxwaz û dîktator û gel û dijminen gel. Xelkê Kurdistana Îranê di van 5 heftiyane de bala hemû hogirêne azadiyê û dadperweriyê ji bo aliye xwe rakişandine û cihan bi vê çenda ku li Îranê û bi taybet di Kurdistanê de derbas dibe, hesandine.

Tevgera Kurd di hemû perçeyên

Kurdistanê de gavêne mezin ber bi nasandina daxwazên xwe yêne berheq bi dunyayê avêtine, di Turkiyê û Sûriyê de ku hetanî çend salan berî niha nav birin ji Kurd û tevgera Kurd bi tawan û guneh dihate hesibandin, desthilatbdesten van welatane neçar bûn her nebe rastiya bûna Kurd û tevgera heqxwazane ya wî neteweyî bipejirînin.

Li Îraqê tevgera Kurd di encama dehan sal xebat, xwe gorîkirin û mifah standina zîrekane û bi dem ya serokatiya tevgera Kurd di rewşa piştî şerê kendavê û hiloşîna rejîma Sedam Husê de, yê bûye yek ji parematrên bibandor yê meydana siyasi ya Îraqê ku di asta herêmê û navneteweyî jî de hesabeke taybetî li ser tê kirin û ber bi vê çendê diçe ku ew maf û azadiyên di pazdeh salen cûyî de ji bo Kurdê vê para Kurdistanê hatine bidestxistin bi yekcarî cîgir bike û di qanûna bingehîn ya welat û kom û komeleyên navneteweyî de bi fermîbihê naskirin.

Dîktatorên li derdora me yan hatine hilweşandin yan rojê temenê wan ketiye jimartinê. Bayê azadiyê ku ji mîjdem e dest pê bûye, mijûl e dibe bi bahozez ku text û bextê hemû zordaran bi xwe re dibe û têk dişkîne. Di Rewseke wiha de rejîmîn kevn û kevneprest bi piştgirî ji diyardeya mirar û qirêj ya terorê û alîkarî kirina terorîzma cîhanî dixwazin çend rojan temenê desthilata tejî tawan û hovîtiya xwe dirêj bikin. Aşkira ye ku di rewseke wiha de hemû hêzên siyasi yêne pêşkevtinxwaz ku çepera jêhatî ya xwe, çepera berevrû bûn teví terorê, terorist û terorîstperweran xurt bikin heya ku şansê dawiyê yê man di desthilata dijî gelîyane û yek ji wan Komara İslâmî bistînin.

Hevwelatiyên rîzdar!

Em gelek baş dizanin ku civatên xelkê Kurdistanê û seranserî Îranê çi çavnihîriyek ji PDK Îranê hene û di rewşa niha de ci erk û wezîfeyen giran û girîng dike ser milê vê partiyê. Em baş haydar in ku rewşa hundir, herêmî û navneteweyî herçiqas jî amade be, hemû neteweyek, hemû tevgerek û hemû hêzeke siyasi bi vê qasê dikare bidestxistian lê bibe ku di hewl û xebata guhertin û guherandinê de bandora xwe dike. Lewre Komîteya Navendî ya PDK Îranê di boneya pîroz ya şestemîn salvegera avakirina partiyê de, ji civatên xelkê Kurdistanê re sozê bide ku:

- Bi hemû şıyan û karîna xwe ji bo bihêzkirina refê PDK Îranê bixebite, rewseke jêhatîtir amade bike ku ev partiye ji hemû heyîn, îmkanatên xwe û ji şiyana kit kîte xebatkarêne xwe mifahê bistîne. Eva mezintirin garanti ye ji bo berbipêşdeğûna Partiya me û rîya tenê ya besdariya bibandor di vê pêvajoya serbilindî afirandinê ye ku di welatê me û devera me de dest pê kiriye û çavnihêriya pêşdeğûnê jê tê kirin.

- Peywendîya xwe tevî civatêne xelkê Kurdistanê û van serhildanê berfireh ku çend heftî ye dest pê kiriye, xurtir bike. Çiqas bihê kirin, pitir jê nêzîk be, bandorê li ser bike û bandorê jê werbigre. Divêt karek bihê kirin wekî gelek derfetên din yên dîroka gelê Kurd, ji hev cuda kirina Partiya Demokrat û xelkê Kurdistanê ji bo dost û dijmin kareke dijwar be.

- Hindî îmkan hebe em alîkariya xwe bi hêzên siyasi yên meydana xebata Kurdistanâne Îranê xurtir bikin û li ser alîyê kêm bernameyeke hevpar ji bo xebat di rîya hilosandina rejimê de û ji bo bernamerêtina rojêni piştî guherîna rejimê rî bikevin. Nabe em rî bidin dudestekî û dijberiya di nava hêzên siyasi de bibe valahiye ku dijminen azadiye ji rîya wê bihêne tevgera rizgarîwazane û li hundir de vala û di wateya xwe de betal û bê kakil bikin.

- Her di vê demê de em hewlê bidin peywendiyyê alîkari û hevxebatiyê tevî neteweyêne Îranê û hêzên seranseri yên Îranê xurt bikin. Bernameya hevbes ji bo xebat û organizekirin di navbera parêne tevgera şoreşger ya xelkê Îranê de pêk bînin û li ser xetêni giştî yên sistema hikûmetî ya piştî hilosina Komara İslâmî bigihîjin encamê. Di vî warî de divêt ji bo bihêzkirin û berfirehkirina **Kongireya Neteweyêne Îrana Federal** girîngiyeke taybet bihê dayîn.

- Divêt em peywendiyyêne xwe tevî aliyê besdar di tevgera Kurd de xurtir bikin, bi taybet piştigiriya tevgera pir serbilind ya Kurdistanâne İraqê bikin û ji ceribînen binirx û serkevtî yên wê dersê werbigrin. Aşkira ye ku tevgera rizgarîwaz ya neteweya Kurd her çiqas par par, ji hev hatibe vejetandin, xalêne hevpar û berjewendiyêne hevbes zaf in û divêt ji hemûyan mifaha hewce bihê standin.


- Aqibet divêt em têkiliyêne xwe yên siyasi û diplomasiyê tevî derive çende çê bibe, berfirehtir bikin. Em hewlê bidin dengê heqwxaziya gelê Kurd û tev gelên Îranê bi cîhanê bigihîjinin û hindî çê bibe dost û piştevanan peyda bikin. Cîhe me di çepora xebat ji bo azadiye, wekhevîye û xebat dijî zordarî, këvneperekî û terorîzmê de ye û divêt me roleke berbiçav di vê meydanê de hebe heta ku em bidestxistinê berçav ji bo gelê xwe misoger bikin.

Silav ji bîranîna 60 saliya avabûna PDK Îranê
Silav ji giyanê Pêşewa Qazi Mihemed, avakerê PDK Îranê

Silav ji giyanê şehîdîne rîya rizgariyê û li serweyi wan Qazi, Qasimlo û Şerefkendî

Silav ji girtiyêne siyasi
Silav ji civatêne xelkê Kurdistanê
Bîherife rejîma Komara İslâmî
Bîji Partiya Demokrat ya Kurdistanâne Îranê
Komîteya Nawendî ya Partiya Demokrat ya Kurdistanâne Îranê
25.05. 1384
16.08.2005

60'mîn salvegera avakirina Partiya Demokrat ya Kurdistanâne Îranê hate pîroz kirin



Êvariya roja sêsem 16'ê Tabaxa 2005'an hemberî 25'ê Gelawêja 1384'ê Rojî, bi besdariya Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, birêz Mistefa Hicrî, Endamên Deftera Siyasi, Komîteya Nevendî, şandeke Partiya Sosyalist ya Kurdistanâne Turkiyê, Kadro û Pêşmergeyên Partiyê û gelek dost û alîgirên PDK Îranê rî û resmeke hêja û berfireh bi boneya 60'mîn salvegera avabûna PDK Îranê hate lidarxistin.

Rê û resm bi sirûda **EY DEMOKRAT** dest pê bû. Piştre Payama rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê hate pêşkêş kirin. Naveroka peyama Kekê Mistefa Hicrî gelek dewlemend û balkêş bû. Mirov dikare bibêje ku gotara wî dîrokî bû. Deqa Peyama Kekê Mistefa Hicrî di hejmara 22 ya Rojnameya **Agirî** dê bihê weşandin.

Peyamên Partiya Yekîtiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê, Partiya Sosyalist ya Kurdistanâne Turkiyê, Peyamên Yekîtiya Ciwanê Demokrat ya Kurdistanâne Îranê û Yekîtiya Jinê Demokrat ya Kurdistanâne Îranê û çend rîxistin û saziyên Kurdistanâne İraqê hatin pêşkêş kirin.

Helbesteke dewlemend ji aliyê Xatûna **Nahid Husêni** ku taze ji bajare Seqiza Kurdistanâne Îranê hatiye Kurdistanâne İraqê û tevlî cejna pûrozkiran 60 saliya PDK Îranê bibû, hate xwendin.

Berdewam nûçeyên pûrozkirina cejna 25'ê Gelavêjê, 60'mîn salvegera avabûna PDK Îranê li bajare Kurdistanâne Îranê ji aliyêne pêşkêşkarên rî û resmî dihat xwendin.

Tevî vê çendê ku rayedarên Komara İslâmî ya Îranê piştî serhildana gelê Kurd li Kurdistanâne Îranê ku mehek dibe dest pê bûye û niha jî her berdewam e, rewşa awarte û hikûmeta leşkerî li Kurdistanâne Îranê hatibû ragihandibûn û hemû gir û ciyayê bajare Kurdistanâne Îranê hisar dabûn ku agirê cejna 25'ê Gelavêjê nehê hilkirin û cejn nehê pîroz kirin. Lê wan nekarîn pêşîya gelê Kurd bigirin û wan cejan 25'ê Gelavêjê û agirê cejnê bi serekvîn û serfirazî hilda.

Gelek sirûd û stranên Kurdî hatin pêşkêş kirin. Koma Çandî û Hunerî ya keçen Kampa Romadiyê ku niha li herêma Kelar û Xaneqîn ya Kurdistanâne İraqê dijin bi stran û govenda Kurdî rî û resm pitir xemilandibûn.

Rê û resmî pûrozkirina Cejna 25'ê Gelavêjê, 60'mîn salvegera avabûna Partiyê bi dîlan û govenda Kurdî ya besdaran bi awayekî berfireh û bi coşkeke gelek mezin dawî pê hat.

Peyama Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di rê û resma bîranîna 60 saliya avakirina Partiyê de

Xelkê hisyar û azadîxwaz yê Kurdistanê!

Malbatên serbilind yên şehîdan û girtiyên berxwedeler yên siyasi!

Endam û aligirêñ fidakar û şoreşvan yên Partiya me!


Kadro û Pêşmergeyên çavnetirs û xebatkar yên gel û Partiyê!

Îro 25'ê Gelawêja sala 1384'ê Rojî (16.08.2005), Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê, Partiya xweştevî ya civatêñ xelkê Kurdistanê, Partiya Pêşewa Qazi Mihemed, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî û Partiya hezaran şehîdên sorxelat yên neteweya me, bi serbilindî ve 60'min xetîra temenê teji serifrazi ya xwe hil dike û di bin ronahiya wê xetîra geş û birisqî da, karwanê tevgera neteweyî-demokratik ya Kurdistana Îranê ber bi bilindahiya hêviyê û ji bo bidestveanîna armancêñ me yên mezîn dixe rîyê. Bi vê hincetê ve ez ji aliye rîberiya partiya me ya xebatkar pîrozbahîyên germ pêşkêşî we dikim û bi hêviyâ rojêñ geş û cejneke mezintir.

Em di demekê de bîranîna 60'min sala avakirina partiya xwe ya xebatkar dikin ku gelê me yên mafxwaz di Kurdistana Îranê de, ketiye ber bêrehmanetirîn awayên lêdan û serkuta sedsalêñ navîn ji aliye rejîmekî Faşistî ya desthilatdar bi ser Îranê de. Lê hevdem tevî vê kul û kovanê de, em xwe bi serifraz dizanîn ku niha jî û piştî derbasbûna 6 dehsalan bi ser xebata bêrawestan ya partiya me, gavêñ me ji bo meşandina reýa xebatê xurtir û gelê me hisyartir û asoya serekvtinê geştir e.

Hevalên rîzdar, xelkê mafxwaz û azadîxwaz yê Kurdistanê!

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê di roja 25'ê Gelawêja 1324'ê Rojî (16.08.1945), li ser bingehêñ rîexistinî yên Komeleya Vejandina Kurd û bi merema kanalizekirin û piraktîzevirina xebatê ji bo bidestveanîna mafêñ berheq yên gelê Kurd di Kurdistana Îranê de hate ava kirin û ji wê demê were heta îro komek bidestxistiyêñ binix û hêja ji bo bizava demokrasîwaziya Îranê bi giştî û nemaze ji bo gelê bindest û mafxwaz yê Kurd di Kurdistana Îranê de bi diyarî anije. Bi bîr û fikra ronahî ya Pêşewayê Partiyê û desten bihêz yên PDK Îranê, heyameke kurt piştî



avakirina vê partiya xebatkar de, **Komara Demokratik ya**

Kurdistanê hate ava kirin û li gor wî serdemî û di hemû devera Rojhilata Navîn de, kareki mezin bû. Pirensipê vê Komarê bi awayeke wisa demokratik bûn ku heya niha jî pareke nevegetiyayî ji armancêñ bilind yên xelkê Kurdistanê û partiya avaker ya Komara Kurdistanê ne. Eger ci temenê vê Komara canemerg kîmtir ji salekê bû, lê niha navê mezin û nirkêñ wê yên demokratik wekî stêrk di dîroka xebata demokrasîwazane ya gelên Rojhilata Navîn de dibiriqin.

Dijminê dilreş yên gelê me wisan dizanî ku bi birîna serê Komarê û fetisandina Serok Komarê Kurdistanê, dê xwîna şoreş û berxwedanê di şademarêñ partiyê û gel de hişk dibe û cendekeke sar, bêhêz û bêvîn di şûnda bicî dimîne. Salêñ piştî ji holê rakirina Komara Kurdistanê, bi sedema natebahiya hevkêşeyen siyasi yên navneteweyî û herêmî tevî xwestek û daxwazên demokratik yên gel de, yek ji qonaxêñ dijwar yên dîroka teji asteng û kosp ya tevgera me ya mafxwaz bû.

Di wê qonaxê de rewşa dijwar ya hundir di Îranê û herêmî de perdeyekî lawaz û bêdeng bi ser partiya me de kişandibû û kêm mabû toyê bê hêvityê di dilê gelê me de bîhê çandin. Lê çeqmaqa tivinga Pêşmergeyên cihêñ hêviyâ

vê partiyê di sala 1364 (1968)'an de careke din pif kire agirdanka şoreş û careke din ev agirê pîroz hate gesandin. Bi vî awayî dawî bi vê qonaxa tarî hat û perdeya bêdengiyê hate şikandin û di hemû Îranê û deverê de deng veda. Rejîma Paşatiyê kete lerizînê û keniya hêviyê bo ser lêv û dilên têniyê geşbûnê vegeeria. Her çend nîsandana termê dabêj dabêj kiri yên pehlewan û mîrxasên afirîneren wî şarî û tevgerê ji aliye rejîma Paşatiyê li bajarêñ Kurdistanê bi armanca çavtîrsandin û kuştina hêviyâ dawiyê ya xelkê bû, lê rast berevajî vê, vejandineke nû bû ku şîyan, hêz û wêrek da gelê me û wekî ew beyta helbesta ku di Farsî da heye xuya kir ku **ev rîle ji pilîngan vala û betal nebûye**. Silav ji canê wan koma şîdîn serbilind ku bi gorîkirina jiyanâ xwe, hêvî dane gel.

Derketina kesatiya bilind û xebatkar ya Dr. Qasimlo, yek ji wan hêzan bû ku di wê qonaxê de jiyanekê nû da partiyê. Lewra nabe bas ji dîroka partiyê û heta dîroka bizava demokrasîwaziya Rojhilata Navîn bihê kirin û rîberê zana Dr. Ebdulrehman Qasimlo di bilindirîn elenda mafxwazî û demokrasîwaziyê de wekî ciyayekê nesekinî be. Teybetmendiyê qahîm û bilind yên Qasimloyê rîber bûne sedema vê çendê ku di roja 22'ê Pûşpera sala 1368'an da (1989) ev mirovî astîxwaz kete ber êrîşa guleya xedr û hov ya diplomat-terorîstên Komara İslâmî ya Îranê û li ser maseya bi nav gotobêjê de jiyanâ pir ji serifrazi ya xwe ji dest da.

Dibêjin mirina mirovî mezin bi xwe rabûn û ji dayîkbûneke dinê ye, eva ji di pêwendî tevî koça Qasimloyê rîber de bi aşkira hate xuya kirin û bîr û ramanê Qasimlo bû bi rîbaza hertimî ya PDK Îranê û dirûşma dijmin bezandinê ya **Qasimlo, Qasimlo rîya te dirêjî heye**, piştî derbasbûna 16 salan bûye dirûşma sereke ya xelkê emegdar û azadîxwaz yê bajar û gundêñ Kurdistanê.

Her çend ku terora Dr. Qasimlo birîneke Kûr xiste cendekê tevgera me ya berheq, lê Qasimloyê zana kesek nebû ku qedera partiyê bispêre qeza û qederê, her ji ber vê çendê di heyamê jiyanâ teji jî serbilindahiya xwe de şagirdên wisan elîmandin ku bikarin

berpirsiyariya rêberikirina xebatê bidestve bigirin. Her lewra piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo, şagirdê biemeg û rastbêj yê rîbaza Qasimlo, Dr. Seîd Şerefkendî, bi kîrhatîbûn û micidiyeke kêm wêne, pêşîya karwanê xebatê girte stûyê xwe û nehêla **bê Qasimloyî** di rûçik û rûyê gel û partiyê de xuya bibe.

Çekçekûleyên Tehranê, demekê ku ji bo wan rohn û aşkera bû Dr. Seîd micidane û mandînenasane rîberiya partiyê û tevgera neteweyî-demokratîk ya Kurdistanê dike û hêvî û hêzê dibexşîne civatê xelkê Kurdistanê, çend terorîstên dilres şandine Almanyayê û di pîlan û kiryareke nemirovane de tevî çend xebatkarê din şehîd kir.

Paş şehîdkirina Dr. Seîd, bî keyfxweşî ve şagirdê rîbaza Qasimlo-Şerefkendî nehêlan ala rîberêne mezin yên gel û partiyê bikeve erdê û bi karê bikom û giştî û ji xwe borîneke şorîşvanî, rîbaza şehîdên gel û partiyê domandin û derfet ji rejîma kurdkuj ya Komara İslâmî re nedan ku

gelê me tuşî
bêhîvîtiyê
bike.

**Hevalê
hêja, xelkê
mafawaz yê
Kurdistanê!**

Niha ku 6
dehsal bi ser
xebata
mafawazane
ya partiya me



re derbas bûye, çaxekê ku em lênihîrînê ji paşerojê didin û mîzeyî qonaxêni dijwar yên xebata partiya me ya tekoşer dikin, ev pirsa di hizra me de derdikeye holê: çawa Partiya Demokrat ya Kurdistana Iranê kariye wan qonaxên gîran û dijwar bi serkevtin ve bimeşîne? Çawa berxwedan kariye û tuşî têkçûn û herifinan nebûye û bi serbilindî ve yê bûye partiya xweştevî û berdilê civatê xelkê Kurdistanê?

Renge em bikarin çend sebeban ji bo li ser pê rawestana partiya me destnîşan bikin, lê bi raya min em dikarin sedemîn sereke yên vê berxwedaniyê di van çend hêlan de kurt bikin:

A: Partiya Demokrat, partiya serdemiyane û nûjen

B: Rastdîtina siyasî ya PDK Iranê

**C: Demokrasiya navxwe û raman û nêrînê
mirovhezane yên Partiya Demokrat**

Partiya Demokrat, Partiya serdemiyane û nûjen

PDK Iranê bê lîre û wêde di nav rastiyekî siyasî û civakî de bejin girtiye ku pêk tê ji **hebûna stem û zulma sistematiq ya neteweyî di Kurdistana Iranê de**. Bi vî awayî, PDK Iranê di bingeh de partiyekî neteweyî ye û armanca sereke ya vê partiyê bezandina qonaxa rizgariya neteweyî ye di pêxema avakirina jiyan û sistemekî siyasî ku kîrhatiyê mirov û neteweya vî serdemî be.

Ji wir pêde bo me rohn û aşkira dibe ku PDK Iranê, partiya takekes, girûp yan çînekî taybetî ya civakî nine, belki ev partiya xebatkar, partiya hemû çin û texên civakî yên Kurdistanê û wan tevan di nava refîn xwe de kom dike û ji bo xebateke bêrawestiyan û demokratîk rîk dixe. Ji ber vê, PDK Iranê, Partiyekî nûjen û serdemiyane ye û ji hemû metod û awayê hozî û kevneperekstane dûr e.

Neteweyîbûna PDK Iranê ne bi wê wateyê ye ku ev partiya ji metodê nasyonalîstiya berçavteng peyrewiyê dike, belkî partiya me partiyekî neteweyî ye ku li ser komek bingehê fîkrî û demokratîk sekiniye, bi awayekê ku di xwendingeha vê Partiya Demokrat de, rîz û hurmet ji tev gelan re tê girtin û mafê biryardana qedera hemû gelên cîhan heq têzanîn û di kiryar da ji bo avakirina cîhanekê gavan davêje ku ji hemû terzen çewsandin û perçiqandina regezi, ayînî û çinayetiye dûr be. Ji vê hêlê ve, PDK Iranê ji du aliyan ve bi partiyekî nûjen û serdemiyane tê hesibandin: yanî, him di warê teorî û him di warê piratîk de. Girîngitîn û sereketîn bingehê teorîk yên Partiya Demokrat pêk tê ji: Demokrasî, Peloralîzma olî û kulturi, Omanîzm, sekolarîzm, bawerî bi çareserkirina pirsgirêkan ji rêya aşıtiyane ve, bawerî bi mafê gerdûnî yên mirov, wekheviya gelan di mafê siyasî de, wekheviya jin û mîran di civakê û cihê kar kirinê da, ret û mandelkirina terorîzmê û parastina hurmeta mirov di dijwartirîn



qonaxê
xebatê de.

PDK Iranê
ev mjarane
weki
dirûşmîn
bêbingeh yê
siyasî û bi
merema
xapandina
xelkê ne
hilgirtiye,

belki baweriyeke kûr bi van mijarane heye û di kiryarê de ji wan peyrewî kiriye û ev rastiya ji bo dost û dijmin jî rohn bûye. Organize kîrin û hevgirtina bingehê teorîk yên PDK Iranê tevî piratîkê wê partiyê de, bûye sedema jêhelçûna nîfûz û pirestîja partiyê di nav civatê xelkê Kurdistanê de, û çendin sal e ku ev partiyekî ku bûye partiya xweştevî û berdilê hemû çin û texên civaka Kurdistanê. Girêdayî bûna partiyê bi wan pirensipen demokratîk di asta deverê û navneteweyî de jî, hitbareke kîrhatî ji bo Partiya Demokrat desteber kiriye. Li wir em dikairin îşarê bi çend nimûneyên nûjenî û serdemiyane yên partiyê bikin: Damezrandina Komara Demokratîk ya Kurdistana Iranê, pêkanîna Yekîtiya Jinê Demokrat ya Kurdistana Iranê û Yekîtiya Ciwanê Demokrat ya Kurdistana Iranê, di çaxekê de ku di civakê de pûte û girîngiyeke wisan bi van texane nehatiye dayîn. Mehkûmkirina dagîrkirina Balyozxaneyê Amerîka ji aliyê Xwandekarên Peyrewê Rêya Îmam ve, pêşwazî ji dawî pêhatina şerî malwîranker yê Iranê û Iraqê, parastina berjewendiyen mezin yên neteweya Kurd di her çar parçeyen Kurdistanê de û retkirina partîtya demargirjane, hewildan ji bo pêkanîna pilatormeke demokratîk di navbera partiyên Kurdistanî û partiyen seranserî yên Iranê, parastina ceribînên binirx yên Hikûmeta Herêma Kurdistana Iraqê, rol û bandora berbiçav ya partiyê di pêkanîna **Kongireya Neteweyên Iranâ Federal** de, pêşwazî kîrin ji pirosesa demokratîzasiyonê di Rojhilata Navîn û pirojeya Rojhilata Navîn ya Mezin û çendin û çend mînakên nûjen û serdemiyane yên din.

**Rastdîtina siyasî ya Partiya Demokrat ya
Kurdistana Iranê**

PDK Îranê ji ber vê çendê ku partiyekî şoreşger e û li ser vê baweriyê ye ku pêkhateya siyasi-civakî ya Îranê û Kurdistanê tevî jiyan û sîstema rêxistinî ya serdemiyane û nûjen de natebah e, armanca vê partiyê herifandina vê sîstema paşverû di réya avakirina jiyanekî kérhatî û sistemekî û teba tevî serdem û mafên xwezayî û bingehîn yên mirovan de ye, bi vî halî ji PDK Îranê bawerî bi "Miyanerewiya" siyasi heye, û ew "miyanerewî" ya siyasi ji ji rasdîtina siyasi ya wê partiya xebatkar ve çavkanî digire. PDK Îranê çi demekê xebat nekiriye ku teoriyên siyasi û civakî bi ser rastiya siyasi û civakî de bisepîne, belkî ev partîye di pêvajoya xebata piratîkî de gihiştîye teoriya siyasi û civakî û ew teoriyane ji bo xizmet bi civakê pêşkêşî rastiya civakî kiriye. Ev pirosêsa bi awayekî karzanane peya kiriye, bi terzekê ku nebûye sedema hilweşandina bingehîn hewce yên civakê û di heman deme de ji civaka Kurdistanî li ser bingeha hişyariya civakî û siyasi ve pêş xistiye. Ev rasdîtina siyasi ya partiyê, renge di demeke Kurt de bibîte sedema barîna rexne û gazindayan ji aliyê dost û dijminan ve, lê berbipêşdeçûna **Demê** rastî û dirustiya helwêstên PDK Îranê ji hemûyan re aşkira kiriye û bûye sedema jêhelçûna asta hitbara civatên xelkê Kurdistanê bi partiya wan ya xebatkar re.

PDK Îranê bi dirêjahiya 6 dehsal ji temenê tejî şanazî û serbilindî yê xwe, dirûşm û sozek bi xelkê Kurdistanê nedaye ku jê re nehê cî bi cî kîrîn û gelek pitir ji dirûşm û sozen xwe, xizmet bi doza berheq ya neteweya Kurd bi giştî û bi taybetî gelê Kurd li Kurdistanâ Îranê kiriye. Eva ji vedigere bo bawerîya kûr ya rêberê berê û niha yên partiyê bi xelkê Kurdistanê û fêmkirina vê rastiya haşalênekirî ku xelkê Kurdistanê stûna pişta PDK Îranê ye û PDK Îranê ji gevriya bang û hawara mafxwaziya civatên xelkê Kurdistanê ye.

Demokrasiya navxwe û raman û nêrinêne mirovhezane yên Partiya Demokrat

Mamostayê demokrasiyê, şehîdê hertim nemir Dr. Ebdulrehman Qasimlo derheq demokrasiyê dibêje: "Ewa ku ji bo partiya me, hemû wextekê ji tevan girîngitir e, ci di hundirê partiyê de û ci li derveyî partiyê de, xebat ji bo demokrasiyê ye. Divêt ev xebate berdewam û bêrawestiyan bihê kîrîn. Xebat ji bo demokrasiyê tu demekê nabe biçe bin siya xebat ji bo mafên neteweyî yan xebata tex û çinatîyê. Ji ber ku ewa sedema pêk hatina Partiya Demokrat e, heta ku Partiya Demokrat maye, demokrasî merem û armanca wê ye".

Her çend, PDK Îranê partiyekî neteweyî ye û stema neteweyî di pêkhatina vê partiya çeleng de haydarê sereke bûye, lê hevdem, demokrasi yek ji wan bingeh û kolekeyen sereke bûye ku her di destpêkê de ew partîye li ser hatîye avakirin. Yanî, PDK Îranê tenê partiyekî neteweyî nine ku armanca wê tenê rizgariya neteweyî be, bê vê çendê ku sistemekî rêxistinî ya jiyana civakî destnîşan bike. Ji vê dîtingehê ve, PDK Îranê, partiyekî neteweyî ye ku armanca sereke ya wê partiyê cîgirkirina qonaxa rizgariya nîştimanî di réya damezrandina sistemekî siyasi-civakî ya wisan de ye, ku tê da rêzê ji buhaya hebûna mirov ku azadî ye bigre. Azadî nirx û armancek e ku tenê di sîstema demokratik de rê ji bo pêşveçûn û berfirehbûna wê xwe dibe. Ku wisan e em dikarin bibêjin ku demokrasî û rêzgirtin ji mafên mirovan û parastina wan mafane, felsefeya pêkhatina Partiya Demokrat e û demokrasî bûye yek ji parametrên bingehîn yên nasnameya PDK Îranê.

Di PDK Îranê de, azadiya ra derbirînê û dîtin û nêrinêne

siyasi bi tevahî hatîye cîgir kirin û her endameke partiyê dikare li ser her pirseke siyasi, dîtin û nêrinêne xwe bide xuya kirin, bi vî mercî ku kesayetiya takekesan biparêze û bikare nêrinêne xwe bi piştgirêdan bi belgeya rast û dirust bide selimandin. Cîgirbûna demokrasiya navxweyi bûye sedema vê çendê ku PDK Îranê heta niha serkevtyane 13 kongireyan lidar bixe û di nav kongireyan de rê ji bo dest bi dest kirina desthilatê xweş biket. Her çend ku 60 sal bi ser temenê tejî serfiraziya partiyê derbas bûye, lê PDK Îranê partiyekî bihêz, afirîner û loçen pîrbûnê û kalyê neketiye rûmeta wê. Sedema xurtbûna wan hêzên bingehdar di nav PDK Îranê de bo vê çendê vedigere ku di nav sîstema Partiya Demokrat de, rê ji nû bûn û dest bi dest kirina desthilatê nehatiye girtin, ew nebûne jî alîkarê partiyê bûye ji bo xwe rêxistin tevî pêvajoya serdem de û organîzekirina bernameyên partiyê tevî hevarîşeyen siyasi yên nû ên deverê û cîhanê!

Hevalên hêja, endamên xebatkar yên partiyê û xelkê mafxwaz yên Kurdistanê!

Em di demekê de bîranîna 60'mîn salvegera avakirina partiya xwe ya çeleng dikin û bi vê boneya pîroz ve cejnê digirin, ku pirosêsa cîhanbûna siyaset û aboriyê hemû deverên cîhanê girtiye û hevarîşeyen siyasi guhartineke mezin bi xwe ve girtiye û encamên dawîhatina şerê sar gîhiştîye dilê Rojhilata Navîn. Babelîska xurt ya demokratîzasyonê bûye sedema ji holê rabûna du rejîmên dîktator ya Talibana Efstanîstanê û rejîma Bees ya İraqê û bi keyfxweşî ve gelê Kurd di Kurdistanâ İraqê de, kariye parek ji mafên xwe yên neteweyî bidest bixe û xebat ji bo bidestxistina mafên din yê gelê Kurd didome. Di parêñ din yên Kurdistanê de jî, tekoşerên Kurd xebat ji bo bidestveanîna mafên rewa û zevtkirî yên neteweya Kurd xurt kîrine.

26 sal bi ser temenê tejî ji tawan, çewsandin û terorê yê rejîma dîktator ya Komara İslâmî ya Îranê derbas bûye û di binav hilbijartina wê rejîmê de, Ehmedînejad ku derdikeye yek ji gelalerêjîn terora rêberê me yê mezin Dr. Qasimlo bûye, rola sereke di dagîrkirina Balyozxaneya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Tehranê de û rehîngirtina karmendêne wê Balyozxaneyê hebûye, niha yê bûye Serok Komarê vê rejîmê. Kiriz û pirsgirêkên hundir, herêmî û navxweyi yên rejîma azadîkuj heta asteke berçav kûr bûne û Komara İslâmî ber bi roja nemanê ketiye rîyê. Hemû ev guhartinê mezin di kongireya 13'an ya PDK Îranê de, ku nêzîk salekê berî niha pêk hat hatîne rojvî û bi keyfxweşî ve, rîberiya hilbijartî ya Kongireya 13'an li ser xwe rêxistin û organîzekirin tevî pêvajoya nû tekezê dikin. Ev guhartinê mezin û kûr yên hevarîşeyen siyasi yên devera Rojhilata Navîn û cîhanê, komek wezîfe û berpirsiyariyê nû dixe ser milê rîberiya PDK Îranê û civatên mafxwaz yên Kurdistanê. Erkê rîberiya PDK Îranê ye ku fikir ji şêwaz û awayen nû bike û sîstema nû ya xebatê darêje hetanî gelê me bi hêviyên dêrîn yên neteweyî û demokratik yên xwe bigihîje. Hewce ye, civatên mafxwaz yê Kurdistanâ têkiliyên xwe bi PDK Îranê re gelek pitir ji caran zêdetir bikin û bîr û fîkrê ji awayen nû yên xebata gelî û medenî bikin.

Hevalên hêja, civatên biwîr û mafxwaz yên Kurdistanê!

Her wekî em hemû agehdar in, di roja 18'ê Pûşpera îsal de, piştî şehîdkirina ciwanekî Mehebadî bi navê **Şiwanê** û sivikatî bi termê wî, xelkê azadixwaz yê

bajarê Mehabadê rijiyanê ser rê û şeqaman û ji rejîmê xwastin ku bikuj û işkencekerên vê tawan û guneha hov û nemirovane bîhêne daghehî kirin û bi sizayê rewa yê xwe bigihîjin. Lî rejîma Kurdkuj ya Komara İslâmî li cihê guhpêdan bi daxwazê berheq yên xelkê, bi serkût û tund û tûjiyê bersiv da. Dîrokê selimandiye ku serkut û tund û tûji nikare pîrsîrêkan çareser bike, belki roj bo rojê kûrtir dike. Xelkê bajarê Mehabadê piştî vê bûyerê û di roja 22'ê Pûşperê, salroja şehîdbûna serokê xwe Dr. Qasimlo, bi hinceta vê bîranînê û xuyakirina nefret û bêzariya xwe ji kuştina şehîd Şiwane dukan û bazarêna xwe daxistin û nerazîbûn û bêzariya xwe ji rejîma terorîstperwer ya Komara İslâmî ya Îranê nişan dan û selimandin ku piştî derbasbûna 16 salan ne tenê cinayeta şehîdkirina Dr. Qasimlo nehatîye ji bîr kirin, belki ew navê mezin û bilind rînişanderê mafxwazî, şoresh û berxwedanê ye. Piştî hêdî hêdî piraniya bajaran bi lidarxistina meş û xwepêşandanen mezin yên gelî û daxistina bazaran, dengê mafxwaziya xwe bi guhê hemû gelên cihanê gehand û ji bo tevan ev rastiye rohn û aşkîra bû ku serbarê serkûta sistematič ya 26 saliya Komara İslâmî, gelê Kurd li Kurdistana Îranê bi tevahî ji maf û azadiyên xwe nasyar e û di vê rîyê de amadeyi her cure fidakarî, cangorîkirin û tekoşinekê ye.

Mixabin di wan rêze meşen gelî de, sedan kes ji xorten biemeg yên gel bi guleya şevperesten Komara İslâmî ya Îranê şehîd û birîndar bûn û hejmareke berçave din ji ciwan û xebatkarên gel rapêçî girtîgehîn reş û tarî yên Komara İslâmî ya Îranê hatine kirin.

Ev serhildana dawiyê, bi mezintirîn, birnaveroktirîn û

geliştirîn xwepêşandanen xelkê Kurdistanê piştî avakirina Komara İslâmî ya Îranê tê hesibandin û ceribîneke binirx ji bo hewil û gavên pêştir yên gelê mafxwaze Kurdistanê ye. Lewra hewce ye, gelê me û partiya me xalêñ jar û lawaz yên vê serhildanê destnîşan bikin û xalêñ wê yên bîhêz jî xurtir bikin û ceribînen binirx jê werbigirin. Li wir ez bi pêwîst dizanîm serê rezê ji bo hemû wan xebatkarane bitevînim ku bi awayekê di wê berxwedana qehremanane de rol hebûye. Li ser navê PDK Îranê ve jî em behî û serxweşîya xwe pêşkêşî malbatên serbilind yên şehîden wan xwenîşandanen dikin û xwe di kul, xem û kovana ji destdana xorten wan de şîrîk û beşdar dizanî û daxwazê ji xelkê Kurdistanê û hemû azadîxwazên Îranê û cihanê dikin ku ji bo azadkirina girtiyen qehreman yên wan xwepêşandanane ji her cure hewl û xebatekê kîmasiyê nekin.

Di vê boneya pîroz de, li ser navê tev reberiya partîyê û gişt endam û xebatkarên PDK Îranê ve, em serê rez û hurmetê ji bo hemû şehîden sorxelat yên gel û partîyê û xêzan û malbatê serfiraz yên şehîdan û girtiyen berxweder yên siyasi û hemû ew mirovîn dilsoz û welatparêz ku ji bo demekê ji be, di rîya armancen bilind yên PDK Îranê de xebat kirine, ditevînin. Em wan hemûyan piştrast dikin ku PDK Îranê ew ji bîr nekirine û partîya me ya tekoşer bi we sax e û dijî û hûn xwediyê rastin yên PDK Îranê ne.

Hezar silav ji malbatê serbilinde şehîdan û girtiyen siyasi!

Silav ji endam û tagirêن xebatkar yên partîya me!

Silav ji xelkê mafxwaz yê Kurdistanê!

Silav ji 25'ê Gelawêjê, salroja avakirina Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê!

Serkeve xebata gelê me bi reberiya PDK Îranê!

Mirin û neman ji bo rejîma sedsalen navin û terorîstperwer ya Komara İslâmî ya Îranê!

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê derheq rewşa girtiyen xwepêşandanen vê dawiyê yên bajarêna Kurdistanê

Hevwelatiyên birêz!
Xelkê xebatkar yê Kurdistanê!


Piştî nerazîbûn û xwepêşandanen rezoki yên xelkê bajarêna Kurdistanê di heyamê nêzik bi heyvek û nîva

cûyi de, rejîma Komara İslâmî di cihê bersivdan bi nerazîbûna xelkê Kurdistanê û giringî û buhadan bi daxwaziyen wan, wekî siyaseteke hertimî ya xwe dest bi serkut û qirkirina bêrehmane ya gel kir û di encama wan tepeserkiran de, dehan kes hatine kuştin û bi sedan kes birîndar û hatine girtin.

Girtî bi tawan û guneha beşdarîkirin di xwepêşandanen aştîyane de ji aliyê hêzên Întizamî û İtilaat (Sîxor)ê ve bi tundtirîn awayan ketine ber azar û işkenceyan. Di nav girtian de em kesen wekî Xatûna Dr. Roya Tilûî, çalakvana mafê Jinan li Kurdistanê, Seîd Saidî, İclal Qewamî, Madîh Ehmedî û Azad Zemanî yên rojnamevan dibînin. Seîd Saidî û İclal Qewamî ji roja 22'ê Gelawêjê hemberî 13.08.2005'an bi nişana nerazîbûn ji girtin û işkenceya girtian dest bi gireva birçîbûnê kirine. Kesen navhatî bi tundtirîn awayan di bin işkenceya cendekî û ruhî de ne û di rewseke nebaş de dijîn û jiyana wan di xeter û tirsî de ye.

Em teví mehkûmkirina kiryarêñ dijî mirovî yên rejîmê, daxwazê ji hemû kom û komeleyen mirovez, rîexistinê parastina mafê mirovan, Erûya Navneteweyî û hemû rîexistinê siyasi û mirovdost dikin ku ji bo rizgariya girtiyen siyasi bi giştî û Dr. Roya Tilûî, Seîd Saidî, İclal Qewamî, Madîh Ehmedî û Azad Zemanî bi taybetî hewl û xebatê bidin û zext û givaşê bixinê ser rejîma Komara İslâmî û dengê nerazîbûna xwe di vê derheq de bilind bikin. Berevanî kirin ji wan girtiyen siyasi, berevanî ji mafê mirovan û berevanî ji azadî û demokrasiyê ye.

Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat ya kurdistana Îranê
22.08.2005
31.05.1384



Nameya Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, birêz Mistefa Hicrî ji bo Kofi Enan



Birêz Kofi Enan, Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî

Ez bi hewce dizanim te haydar bikim ku di heyamê heyva çûyî de xelkê bajarên Kurdistana Îranê bi hinceta 16'min salvegera terora Dr. Qasimlo ku di 13.07.1989'an de li Viyenê bi destê terorîstên Komara İslâmî hate teror kirin û her wiha hilbijartina Mehmûd Ehmedînejad wekî yek ji sebebkarên wê terorê bi Serok Komariya rejîmê, rêze meş û xwepêşandaneke nerazîbûnê yên aşıtiyane lidarxist. Mixabin ew meşen nerazîbûnê yên aşıtiyane û aram li hemû bajarên Kurdistanê ji alyî dezgehêن Îtilaat (Sixor û Ajanê) û hêzên leşkerî yên Komara İslâmî ve bi xwînê hate gevizandin û tevî serkutkirina gelek tund û bêrehmane ya wan rû bi rû bûn û bi dehan kes ji xwepêşander bi teqandina guleyên çekêن rejîmê hatine kuştin ku hetanî niha cenazeyê çend kes ji wan bi van navane hatine nasîn:

1.Seyîd Kemal Esferam, 2.Omer Bayezîdî, 3.Bayezîd Merûfi, 4.Cemîle Xîzî, 5.Hekîme Sor, 6.Luqman Nesrulayî, 7.Mihemed Şerîeti, 8.Ebas Remezanî, 9.Husên Remezanî, 10.Ferzad Mihemedî, 11.Şadman Mihemedî, 12.Husên Ebdî.

Her wiha pitir ji 300 kes ji birîndar bûne û hejmarek ji wan ji hatine girtin û rapêçî girtîgehê hatine kirin û di bin îşkenceya tund û bêrehmane ya celadên rejîmê de ne û bi qeder û çarenivîseke ne xuya re rû bi rû hatine kirin, bi awayekê ku hetanî niha 4 kes ji girtiyên bajarê Mehabadê di bin îşkenceya de jiyana xwe ji dest dane û termêن wan bi malbatêن wan hatine dayîn.

Niha hemû bajarên Kurdan yên Îranê di 4 Parêzgehêن Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kırmaşan û Îlamê de bi tevahî hatine **Militarize** kirin û **Rewşa Awarte** û **Hikûmeta Leşkerî** tê de dimeşe. Hêzên rejîmê ji şewitandin û agirberdana dukan û bazarên bajaran dest ber nadin û ziyan û xisarê zaf bi xelkê gihadine. Birîndar di nexweşxaneyan de bê çareseriya nojdarî ji hêla hêzên rejîmê ve ji işkencegehan re têن birin û piraniya birîndaran ji ji ber vê çendê ku nekevine destê hêzên rejîmê di Penaga û malan de xwe diveşîrin û dimînin û destê wan bi bijîk, derman û imkanatên nojdariyê nagîhîje. Her civîneke 3 kesî û her hatin û cûneke xelkê qedexe ye û tenahiya canî û malî ya xelkê yê ketiye ber tirs û xetera micid.

Di vê derheqê de bêdengiya kom û komeleyên navneteweyî yên alîgirêñ mafêñ mirovan, ji bo gelê Kurdistanê ciyê heyrîmanê ye. Her çend hetanî niha pitir ji 20 caran Komara İslâmî ya Îranê ji alyî Komîsyona Mafêñ Mirovan ya Rêxistian Neteweyen Yekbûyî ve bi sedema binpêkirina mafêñ mirovan, hatiye mehkûm kirin, lê rejîmê tu car guhartinek bi qazancê demokrasiyê û parastina mafêñ mirovan, di riftar û kiryarêñ xwe de pêk ne aniye ku eva ji ne tenê nabe bibe sedema bêdengî û bêalibûna Rêxistina

Neteweyen Yekbûyî û Komîsyona Mafêñ Mirovan ya vê rêxistinê, belki divêt wan ji bo rû bi rû bûn tevî vê rejîmê hay bide. Çunkî bêdengî li hember riftara dijî mirovane ya Komara İslâmî a Îranê, vê rejîmê ji bo domandina cinayet û binpêkirina mafêñ mirovan, pitir hay dide û destê wê vekirîtir dike.

Gelê Kurd li Kurdistana Îranê bi rêberiya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê ji mîj dem e ku dijî hikûmetên dîktator yên zal û desthilatdar bi ser Îranê de ji bo cîgirkirina demokrasiyê û bidestveanîna mafêñ neteweyî yên gelên Îranê di çarçoveya Îranekî demokratîk û Federal de xebatê dimeşîne, lewra heq nine ev gelê azadîxwaz, ku bi tawana azadîxwaziyê bûye goriyê terorîzma Komara İslâmî û bi awayekî bê rehmane tê serkut û qirkirin, ji ber cavan winda bibe.

Em daxwazê dikin ku seba bûyerên heyva çûyî di Kurdistana Îranê de hûn gavêñ bilez bavêjin û alyî kêm hewl û bizav bihê dayîn:

1.Şandeke ser bi Komîsyona Mafêñ Mirovan ya Rêxistina Neteweyen Yekbûyî seredana Îranê û Kurdistanê bike û ji nêzîk ve ji çawaniya bûyeran vekole.

2.Zext û gîvaşê bixin ser rejîma Komara İslâmî ya Îranê ku girtiyên meşen nerazîbûnê yên vê dawiyê yên bajarên Kurdistanê serbest bihê berdan.

3.Derfet û delîve ji bo wan kesen ku bi sebebê teqandian guleyên hêzên rejîmê birîndar bûne, pêk bihêt hetanî ku bêtirs ji girtin û işkencekirinê seredana nexweşxaneyê bikin û çareseriay birînen wan bihête kirin.

4.Ji çawaniya kuştina wan kesen ku piştî girtin û işkencekirinê di girtîgehê de jiyana xwe ji dest dane vekolîn bihête kirin.

Evana renge kêmtirîn çavnihêriyek bibin ku gelê azadîxwaz û aştîxwaz yê Kurd ji we yê rêzdar û ji Komîsyona Mafêñ Mirovan ya Rêxistina Neteweyen Yekbûyî hene. Em hêvîdar û li benda gavêñ we yên bicî û bilez in, vê hêviyê di dilê xortêñ gelê Kurd wekî geleki demorasîxwaz, aştîxwaz, dijî terorîzmê û pêgirtiyê qanûn, isûl û biryarêñ pesendkiriyan mirovî yên Rêxistina Neteweyen Yekbûyî bihêz û xurt bike ku azadîxwaz, demokrasîxwaz û alîgirêñ mafêñ mirovan, li hember dîktatorî, terorîzm û desthilatêne tebah tevî ruha serdem de bi tenê namînin.

Em li benda hewl û xebatêñ we yên birêz in Rûnîvis ji bo / Komîsyona Mafêñ Mirovan ya Rêxistina Neteweyen Yekbûyî
Spas û hurmet

Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê

Mistefa Hicrî

06.08.2005

15.05.1384

Nameya Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, birêz Mistefa Hicrî ji bo Yekîtiya Ewropayê



Roja 13.07.2005'an, roja terorkirina Dr. Ebdulrehamn Qasimlo, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û hevalên wî li bajarê Viyen, serbajarê Otrişê di sala 1989'an de ye. Di vê rojê de Dr. Qasimlo ku bi navê gotûbêj bi armanca çareserkirina pirsgirêka Kurd li Kurdistana Îranê ji aliyê rejîmê ve hatibû vewwendin, bi destê teroristên Komara İslâmî her li ser maseya gotûbêjê hate teror kirin.

Xelkê bajarê Mehabadê bi merema rîzgirtin ji bîranîna Dr. Qasimlo di 16'mîn salvegera terorkirina wî rîberê Kurd û xuyakirina nerazîbûna xwe ji rejîma Komara İslâmî bi hinceta vê kiryara teroristî û her wiha hilbijartian Mehmûd Ehmedînejad - ku di terora Dr. Qasimlo de dest hebûye - bi Serok Komariya Îranê û bi holê anîna daxwazên xwe yên siyasi di vê rojê de, tevî domandin bi xuyakirina bêzariya xwe ji kuştina ciwanekî Mehabadî bi navê Şîwane piştî îşkencekirineke zaf di roja 18.07.2005'an, dukan û bazarên xwe girêdan û meşeke aştiyane dest pê kirin. Lê hêzên rejîmê bi awayekî bêrehmane êrîş kirin ser xelkê û hejmareke berçav ji wan birîndar kirin û dehan kes ji wan ji zîndanî kirin û di girtîgehê de îşkenceyeke zaf hatine kirin ku di encamê de 4 kes ji wan di bin îşkencyê de jiyana xwe ji dest dane û çend roj piştire termîn wan bi malbatêن wan re hate dayîn.

Xelkê bajarên din yên Kurdistanê ji ji bo xuyakirina nerazîbûnê derheq vê riftara dijî mirovahiyê bi meş û girevgirtinan piştigiriya xwe ji xelkê bajarê Mehabadê nîşan dan.

Bi vî awayî niha nêzîk mehekê ye ku xelkê bajarên Kurdistanê ketine

bin serkut, zext û givaşen Komara İslâmî ya Îranê. Di vî heyamî de nêzîk bi 20 kes ji xelkê hatine kuştin û bi dehan kes birîndar bûne ku birîna hin ji wan gelek dijwar û giran e, bi sedan kes ji hatine girtin û ji girtîgehê re hatine şandin û di bin îşkenceya tund û tûj de ne û xisar û ziyanike zaf ya malî ji xelkê ketiye.

Gelê Kurd li Kurdistan Îranê li benda vê çendê bûn ku welatên demokrat û alîgirên mafân mirovan li Ewropa lênihîrînekê ji vê xelkê belengaz bikin ku di vî serdemî de bi tawan û guneha daxwaza destpêkîtirîn mafân xwe di meşa aştiyane de, wiha bêrehmane dikevine ber êrîşa hêz û aliyên hikûmeteke diktator û can û malê wan tê de biçe û hemû rojekê îşkence û kuştina evladên xwe dibînin.

Em bawer in siyaseta bêdengiya Ewropa derheq bi wan hemû cinayetên Komara İslâmî derheq gelê Kurd û gelên din yên Îranê siyasetek e ku tevî pirensipê demokratîk nateba û cuda ye û em dixwazin bala we ji bo wan xalane rabikêşin ku encama vê siyasetê wekî 25 salên derbasbûyi ne tenê berdewambûna Komara İslâmî ji serkut u tepeseriya xelkê azadîxwaz yê Îranê lêdikeye, heta ev siyaseta nikare alîkariya bidestveanîna berjewendiyê bazirganiyê û armancê we di berevanîkirina Îranê ji projektên çekên Etomî ji be.

Lewra em daxwazê ji we dîkin serbarê mijûlbûna we bi projektên Etomî yên Îranê û gotûbêj û danûstandin tevî vê rejîmê:

1. Sandeke xwedî desthilat ji bo Kurdistanê bişînin bo lêkolînkîrin li ser wan cinayetên rejîmê û çawaniya riftara wan tevî girtiyên xwepêşandanen vê meha dawiyê.

2. Komara İslâmî ya Îranê bi hinceta binpêkirina destpêktirîn mafân mirovê Kurd mehkûm bikin.

3. Daxwazê ji Îranê bikin di zûtirîn dem de girtiyê wan bûyerane serbest berde û ziyan û xisara malî ya xelkê bideteve.

4. Bi micidî daxwazê ji Komara İslâmî bikin ku bikuj û îşkencekarên vî xelkî di dadgehekî adîlane de bi zêrevaniya nûnerên Yekîtiya Ewropayê bihêne mehkeme kirin.

Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê

Mistefa Hicrî

06.08.2005

15.05.1384

Daxuyaniya Nûçeyî

Di roja 22.05.1384'ê Rojî, hemberî 13.08.2005'an de, ciwanekî xelkê bajarê Seqizê bi navê Riza Fethî kurê Muhsin ku di xwepêşandana bajarê Seqizê de, li roja 12.05.1384'an de birêve çû, ji aliyê hêzên Întizamî ve hatibû birîndar kirin, di mala xwe de digirin û tevî xwe ji bo cîheke nedîyar dibin. Di şeva 24.05.1384'an hemberî 15.08.2005'an de meytê wî davêjine ber derê mala wan, di halekê de ku devê wî tejî penbû kiribûn û cihê xendiqandinê li ser stûyê wî xuya bû. Em tevî mehkûmkirina vê cinayetê û behî û serexweşî ji malbata wî, ji kom û komelên mirovdost daxwazê dîkin ku vê cinayetê mehkûm û şermezâr bikin.

Komîteya Ragîhandinê ya PDK Îranê

31.05.1384

22.08.2005

Daxuyaniya Nûçeyî

Ciwanekî bajarê Bane bi navê Şefî Suheylayî, kurê Mela Hamid Siyawme ku di xwenîşandaneke bajarê Sine de ji aliyê hêzên Întizamî ve hatibû girtin û heta heyamekê malbata wî ji qedera wî nehaydar bûn, şeva 01.06.1384 (23.05.2005)'an de ji aliyê İtilaata bajarê Banê hatin haydar kirin ku bihîn û meytê kurê xwe werbigirin. Lê ji ber wê ku ji meytê par par kirî yê kurê wan, wêneyan negirin, bi zor malbata wî neçar kirin ku her wê şevê meytê kurê xwe di gundê Siyawmê de veşerin.

Em tevî mehkûmkirina wê cinayetê û behî û serexweşî kirin ji malbata wî şehîdî, ji bo careke din daxwazê ji hemû kom û komeleyên mirovdost, rojnamevan û rewşenbîran dîkin li hember vê cinayeta rejîmê ku em dizanin cinayeta wan ya dawiyê ji nabe, bêdeng nebin.

Komîteya Ragîhandinê ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê

25.08.2005

03.06.1384

Elî Kaşifpûr (1957-1990) nayê ji bîr kirin


Ebdula Hicab

Roja 16'ê Tebaxê, 24'ê Gelavêjê 15. salvegera şehîd bûna heval û hevxebatê nemir, Elî Kaşifpûr e. Têkoşerê mezîn Elî Kaşifpûr, ci li dema xebata Pêşmergayetiyê, ci li dema ku endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û ci li wê dema ku berpirsiyare ye kem yê partiyê li hemû herêma Bakûrê Rojhilata Kurdistanê her tim di rîza yekemîn ya xebat û tehlîkeyên li ser rîya têkoşîna azadiya Kurdistanê de bû. Lewra Eliyê têkoşer li her derî û di her rewşê de armanca yekemîn yê hêzên taritiyê, teroristên Komara İslâmî bû. Derfeta ku di meha Tebaxa 1990'an li bajarê Konya li Turkiyê ketî destê mirovkujên hovde, destê Eliyê azadîxwaz ji malbat û gel vegetand û şîn xiste ser rûye pir ji hêviye "Şetîla" ya rûken û "Aram"ê sawa yê bendiya rîya bab.

Eliyê dilsoz û dilxwazê gel, ji wê roja ku xwe naskir heta dema ku xwe di rîya gel de bext kir, her tim rîya azadiya gel şopand, ji bo serbestiya têkoşîn kir û jîna kurt lê bi kér ya xwe xiste xizmeta doza gelê xwe. Lewra gelê Kurd li Bakûrê Rojhilata Kurdistanê, dilxwazên azadiyê û malbat û hevbîrên Elî, her tim nav û bîranîna Elî berz û pîroz diparêzin.

Komara İslâmî bi terorkirina Elî Kaşifpûr, xebatkarek bi nirx ji refîn têkoşîna Kurdistanê stand, lê nekarî û nikare hêviya azadiyê ji gel bistîne. Bi xwîna ale Elî û şoreşgerên mîna wî re dara hêviya Kurd pitir pel girtin û reh dakuta û niha ber bi hindê ve diçe ku hemû Kurdistan bike baxê newjiyana Rojhilata Navîn a nû.

Îro di 15. salvegera şehîdbûna Elî Kaşifpûr de seranserî welatê wî bûye hêvi û serhildan. Niha baxê ku Elî û Eliyan bi xwîna xwe av dayî, bi xwîna Şîwane Seyîd Qadîrî û şehîden Seqiza bi xwîn ya sertaca serhildanê têr av dibe. Li demekê de ku xelkê Soma û Urmiyê bi nav û bîranîna Eliyan têne meydan, li Sine, Pîrîşar, Mehabad, Serdeş, Bokan, Bane, Merîwan, Dîwandere, Îlam û Kırmaşanan gel ala xebtata ku Elî û hevbîrên wî yên nemir hildanî girtine destê xwe û ber bi armanca Elî ve dimeşin. Li Başûr roja serkevtinê hil daye, li her



Şehîd Elî Kaşifpûr

deverek Bakûr têkoşîn û hêvi heye û li Başûrê Rojava gel bi yekdîngî bûye mortalê parastina nasnameya xwe.

Di 15. salvgera şehîdbûna Kekê Elî de, rîvîngîn rîya wî ji hemû alî, partiyêni siyasi û rîexistinê Rojhilata Kurdistanê daxwaz dikin ji bo ku armanca şehîdan bi cî bînîn, destê yekîti û hevxebatiyê bidin hev. Li serî de Partiya ku Elî hemû jîyana xwe tê de kar kîr û navâ refîn wê de şehîd bûyî, Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û di gel wê ji hemû pêşengê xebata me di Rojhilatê welat de pêwîste rojek ji ya din zûtir li dewra pilatormek hevbeş ya neteweyî kom bibin. Banga gelê me hevgirtin e, hêviya me hevgirtin e û tinê rîya serkevtinê ji her hevgirtin e.

Ji bo bîranîna Elî, hemû şehîden têkoşîna Kurdistanê û bi taybet şehîden serhildan wê dawiyê em hemû bi hev re banga hevgirtinê bilindî bikin.

Esmanê hêviya Kurd wê ber bi vedanê ve diçe, tîrêjîn roja azadiyê wê gul û şîlanen ser mezarê şehîdan vegeşîne û her der û devereke Kurdistanê bike peykera bîranîna şehîdan.

Bîranîna şehîd Elî û hemû şehîdan pîroz be

Bijî yekîti û hevgirtin

Daxuyaniya Çapemeniyê
Parîs 04.08.2005

Dukan û bazarê bajarê Pawe hatin daxistin

Hêzekî zaf ya rejîmê ji Kırmaşanê û bazarê derdor ber bi Pawe hatine şandin

Du hîlokopterên rejîmê ku mijûlê zêrevanîkirina bajar in, amade ne êrîşê bikin ser xelkê

Li gorî nûçeyekê ku her niha gihiştiye Bîroya Nûneriya PDK Îranê li derveyî welat, sibêdeya iro pêncsemî 04.08.2005'an dukan û bazarê bajarê Pawe bo piştgirî ji serhildana xelkê bajarên Seqizê, Sine, Mehabad û bajarê din yên Kurdistanê û ji bo şermezarkirina kiryarê hov û cinayetkarane yên rejîmê dijî xelkê Kurdistanê, bi tevahî hatine daxistin.

Rejîm ji tîrsê serhildana xelkê û ji bo piştgirî ji xwepêşandanana wan, hêzekî teyar û zaf ji bazarê Kırmaşanê û bazarê derdor ber bi bajarê Pawe anîne. Du Hîlokopterên rejîmê bo zêrevanîkirina kiryarê cinayetkarane di halê geriyan li ser bajarê Pawe ne.

13 şehîd û 200 birîndar ji bajarê Seqizê

Li gorî nûçeyen dawiyê, aliyê kêm 13 kes ji xelkê Seqiza serhildayî bi sedema teqelêkirina cinayetkarê Komara İslâmî şehîd û pitir ji 200 kes birîndar bûne. Hejmareke zaf ji xelkê vî bajarî hatine girtin û binçavkirin ku li gorî nûçeyan di dema lêpirsinê de ew hatine işkence kirin û bêhurmetî ji bi wan hatiye kirin.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê serbarê mehkûm û şermezarkirina cinayetîn Komara İslâmî dijî gelê Kurd li Kurdistana Îranê, ji gişt rîexistin û partiyen azadîxwaz li sernaserî cîhanê û nemaze komele û saziyên berevanî ji mafêni mirovan û civaka navneteweyî dixwaze, ku li hember kuştin û serkutkirinê rejîmê bêdeng nerûnên û bi piştevanî ji xwestekên demokratik yên xelkê rabin û ci din rî nedîn Komara İslâmî kiryarê xwe yên cinayetkarane dijî xelkê zulmlêkirî yên Kurd bimeşîne.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê Bîroya Nûneriya Derveyî Welat

Jin, Îslam û Demokrasî di Rojhilata Navîn de

Berhevkirin: Fadiye Fakir
W: Hiwa

Nezma nû ya cîhanî û pirsa aşıya bê demokrasî di gelek welatên Rojhilata Navîn de pêdvîyeke zor bi nûbûn guherandin di nav wan welatan de, bûye egera vê yekê ku gelek rexnegir û rewşenbir pêtir li ser hikûmeta van welatane bifikirin û li ser van welatane dîtinê xwe bidine diyar kirin.

Pêkanîna

guhertînê civakî dikarê welatên Rojhilata Navîn di nava dinyaya nûjen û pêşketî de besdar biket. Pêkanîna van guhertinan û ya cîgirkirina demokrasiyê pêwistî bi destnîşankirina du xalan e: **Yek, rewşa Jinan. Du**, Vejandina ala Îslamê. Her core reformek hevçeyî vê hindê ye ku pirsgirêkan bibe astekî ramyarî û herweha dibe navenda arîse û kêşeyê vejandina Îslamî. Guhertina rewşa jinan di civakan de û li berçavgirtina zulm û zorênu ku hegera berfirehbûna wan ku pir girîng e, şertê sereke yê avedankirina vê civakê ye ku hurmeta mafêni mirovan, serbestiya bingehîn û demokrasiyê biparêze. Serbestiya jinan û demokrasî li bi hev re nizîk in û her du daxwazên hevpiş wek serbestî(medenî û takekesî)ya mafêni mirov, rastî, şerafet, tibatî, serxwebûn, parvekirina desthilatê, azadiya peloralîzmê dişopînin. Daxwaza afirandina xwîndina Femînistî ji dîrokê bang biket. Serbestiya partîyan û gelênu ku kêmter di nav qada siyasi de başdar in, encama azadiya jinan e.

Renge nebûna demokrasiyeye hevpiş di piraniya welatên Rojhilata Navîn de heta qasekî pişikdariya kêmreng ya jinan di siyasetê de şirove biket.

Hevpiş nebûna jinan di siyasetê de sedem û hegerên cur be cur hene. Dema jin hewil dide ku di siyasetên civakên paremayî, eşîretî û kilasîk de besdar be, dê astengên yekcar zor hebin.

Îro em dibînin ku jinan pişikdariyeke kêm di nava siyasetê de heye, hegera vê yekê ji eva ye ku jin di warêne civakî û aborî de paşketî mane. Her çend ku jinan di warê perwerdeyî û warêne din de rola xwe baş lîstiye, lê eva nebûye egera vê hindê ku di nav siyasetê de rolekî berçav hebit. Eva yasa nine ku li dijî mafêni Jinan rawestaye, belkî paşvemana civakê yê bûye sedema pêpeskirina mafêni jinan. Em dibînin ku di gelek civakan de yasayê maf bi jinan daye, lê ji ber ku civak bi xwe gelek paşve ma ye, nahêle ku yasa nehêne bikar anîn. Ji jinan re sinorek diyarîkirî ye coxrafi nine ku ji boy wê herêmeke hilbijartîne destnîşan bikin.

Jinan û bi taybet jinêne berbijar dixwazin ku di kiryar û piraktîkê de wek mîran bin. Tenê bi berfirehkirina armancê demokrasiyê wekheviya jin û mîran avedan dibe. Bi awayekê ku pirsgirêken wekî newekheviya malbatî, kontîrol li ser aloziyê zayendî(cinsi), kontîrola jinan li ser hikûmetê û bîdestxistina wekhev ya çavkaniyê giştî, çareser diket.



Bi rastî di Rojhilata Navîn de demokrasî dê bibe pirek di navbera warêne giştî û taybetî de. Di nav civakên ku jin û mîr bi hev re cuna, siyaset qadek e ku ji mîran re tê hesibandin. Di xwîndinekê de ku Navenda Xwîndinê Stratejîk di warê jin û demokrasiyê di welatê Urdonê de hatiye çapkirin, sedê heşt ya jinan li ser wê bîr û ramanê bûn ku mîr kesayetyeki ramyarî ya çêtir heye û mîr diplamateke bihêz e.

Pirsa civakîkirina jinan bi awayekê hatiye têgihiştin ku jin siyasetê bi tiştekî cîhanî dizane. Di Rojhilata Navîn de jin bi curekê hatiye perwerde kirin ku bi bindestî û kîmasiyênen xwe, bawerî hebe. Jin di Rojhilata Navîn de li ser vê bîr û ramanê ye ku ola Îslamê jin ji siyasetê qedexe yan berbend kirine ku di ayîna rastîn ya Îslamî de ev tişte ci nine.

Jiyana mîr ji ya jinê aqilmendir û bîhêzir e û dikare di siyasetê de serkevtîr pişikdar be. Piraniya jinan li ser vê baweriyê ne ku jin ihsasî û mîr eqlanî ye. Piraniya van dibêjin ku naxwazin endamê ci partyekê bin û ci hezkirinek ninin ku alîgirê partyekê bin, heya jinêne xwendevan jî li ser vê baweriyê ne. Vê demê em dibînin ku di Rojhilata Navîn de jinê xebat û hewleke zor daye li ser pêkanîna hindek yasayan derheq bi perwerde û şareza kirina jinan, jordebirina zaniyariya siyasi ya jinan, wekhevbûna jin û mîran, baştirkirina mafê jinan li nav yasaya medenî.

Du bizavêne giştî di warê xebata jinan de heye: **Yek, bizava Sekolar. Du, bizava Îslamî.**

Femînistîn sekolar daxwaza demokrasiyekî Rojavayî dîkin, lê Femînistîn Îslamî bîr û ramanê daxwaza xwe di çarçoveya peyvîneke Îslamî de didine diyar kirin. Piraniya rexnegir dixwazin ku Îslam di çarçoveya Îslameka Lîberal de bihêt şirove û lêkolîn kirin, ji ber ku ev rexnegir dibêjin ku hinek tefsîr û şiroveyen ola Îslamî li dijî Îslamê ne. Gotara Îslamî ya Lîberal di gel dijberatiya Îslama dewletî rû bi rû bûye. Bihevrebûna xebata jin û mîran ji hewcehiyê here girîng yên civaka îro ne. Bê guman nebûna jinê ci di karê aborî, ramyarî, çandî, civakî û gişt karêne din de xesarek gelek zaf ji leşê civakê dide û nivîşkan bûna wî leşî nişan dide û cudahiya zor di navbera civakên welatên Rojhilat û Rojavayê de vî tiştî baş dide barçavê me.

Qetlêñ namûsî kiryarêñ biheq yan hov?

Amadekar: Emîr Şuaîvend

Ji encama derbasbûna qonaxan, bo mînak ji kevneşöpiyê bo modernîtê û sazkirina hevbendiyekê di navbera baweriyên kevn û zanista îroyîn de, gelek kevneşöpiyên cur bi cur di kûrahiya naveroka xwe de tevlîhev û têk diçin. Baldanekî yek aliyane bi rûçika titâl û kevneşöpiyên kevnar dibe sedema bê hay û bal mana mirovan ji kerameta mirovi. Ev yek jî wisan dike ku emegdar bûn bi



kevneşöpiyê bi ser kesayetiya mirovî de zal be. Kiryarêñ weke **qetlên namûsî** ku reh di baweriyyê kevn yên gelempériya xelkê civakê de heye, yek ji rûçikêñ vê pêvajoyê ye.

Di qetlêñ namûsî de zilam, bav, bira, kur û her mîrekî din yê malbata jinê li bal xwe kuştina jinê bi destê xwe rewa û bi heq dizane. Ev ramana han ku serçawe ji serdemê cehaletê digre, hêj di nava gelemperiya mirovan(jin û mîran) de berdewam e. Gelek ji Mêr jinê weke jîndarekê dizanin ku girîngitirîn karê wê bicîanîna meyl û xerîzeya zayendî ya mîran e.

Li gorî xwedî ramanan, piraniya Mêrên ku dest bi qetlênamûsi didin, ji dest nexweşiyêñ cismî û sewdayî di ezabê de ne. Gelek ji zilaman li gorî cura nêrîn û astê xwendebûnê ve di astekî nizim de ne. Piraniya wan bi sedema ku ne xwediyê kesayeti, zengînî, hêz û kerameta civakî ne ku ev seha xwe ya xwedî milkbûn û kesayeti bexşiyê bi cih bînin, lewre jî ev jina malbatê weke milkê xwe dizanin û kesayetiya ruhî û sewdayiya xwe bi terzekê di wî karê xwe de dibînin. Lewre jî dema bicûktirîn şikekê di jina malbatê de bibînin karê wê bi xivanet û kustina wê iji rewâ dizanin.

Bi sedema perwerde û elimandina şas û nêrînên cur bi cur yên civakê, hebûna jinan di nava civakê de xwe di xwe de bi şik û bi gumanê re ye, lewre jî di civakekî han de axavtin, kenî û her peywendîyeke jinê bi cinsê hember re dikeve ber êrîşên raveyên cur bi cur. Balkêş e ku piraniya mêtîn ku tûşî karêne bi cî û xilaf dîbin, pêtir ji kesên din dest bi getlên namûsî didin.

Pêka xasmaniyê hundirî yên jinan ku meyla wan bi darketina tenahî û rihetiyê di çarçoveyekî dilovanî û zayendiya mîrekê ye, jinêñ ku li derveyî vê çarçoveyê peywendiya cinsî bi kesên din redigrin, ji destê nexweşiyêñ ruhî û cismî ve dinalin, çareserî ji bo jinêñ han tenê jê hay bûn û çavnihêriyêñ bijîşkî û sewda dermanî ye.

Dema ku zilam bi her sedemekê li derveyî malbatê de peywendîa cinsî digrin, jin jî bi sedemên cur bi cur heq didin xwe ku reftarêن taybetî hebin. Lewre jî piraniya kiryarêن jinan yên ne exlaqî diikirvarek e li hember kiryarêن hevjiyên wan.

Jéder: Malpera Nûçegihana Sîna

Fonda Muzîk û Hunerê ya
Şivan Perwer dest bi
xebatê kir

Hunermendê navdar yê Kurd, Şivan Perwer
dest bi avakirina Saziyeke nû kiriye ku armanca
wê xizmet û nasandina çand û hunera Kurdi ye.

Fonda Muzîk û Hunerê ya Şivan Perwer
ji bo çand û hunera navnetewî wek Dengê Kurd
ji bo cîhanê xwe dide naskirin.

Di parek ji daxuyanî û programa vê Fondê de hatiye:

"Vîzyona Fonda Şivan Perwer ji bona çand û hunera navnetewî ev e; ji bo paş û pêşeroja mirovantiyê ku bi pirensîba toleransekî gerdûni, li rêgeh û şopa aştixwazî, hevkârî û destbiratî herdem elementên çand û huner, bibîranîn, dîroka Kurda di jiyana rojanî de lêkolîn, vejilandin, nûjenkîrin, pêşxistin û dewlemendkîrin e. Bi çand û hunera mirovantiyê re danûstandin, li gel wan eyemet û rûmeta berhemên añafrandinê mirovantiyê de cih girtin û xwedanenaskîrin e. Armanc û daxwaziya piratîk jî herdem ji bona hevkârî, alîkarî û pêşvebirina muzîk û muzisyen, huner û hunermend, ziman, rêziman û zimanzan, wêne û wênevan, wêje û wêjekar, şano û şanoger, nîvis û nivîskar û film û filmçeker e. Ji bona di warê navnetewî de pêkanîna dostî û destgirtina gel û miletan, diyaloqa hevaltî û vekirina

rêgeha derfetên aborî û civakî ye."

Di doma programa Fonda Çand û Hunerê ya
Şivan Perwer de hatiye: " Fonda me serbixwe ye
lê bê teref li xizmeta hemû rêxistin, saziyên
hunerî û (konevan) siyasiye. Li gel wan herdem
hevkar, alîkar û cihgir e. Rêzdarî kar û bar e.
Dost e, heval e.

Kesên navnayewiyêñ bi nav û deng ku di nav xizmeta (krouatorium) endamiya firazî de cih girtine ji bê teref in. Emê krouatorium ji were di demeke nezik de zelal bikin.

Têkiliyên Fondê bi hemû komele, Enstitû Akademî û saziyên çandî û huneriyên Kurd û navnetewî re heye. Herdem li gel wan ji bo hevkariyê ji xizmetê re amade ye. Bi UNESCO re hevalbend e. Di saziya gelên navnetewî (ECOSOC) de qeyd (akredite) bûye."

**Navnîşana malpera Fondê li ser internête:
<http://www.sp-f.org/>**


Peywendiyâ tund û tûjiyê dijî jinan û rewşa karê wan di gel hev



Li gor lêkolînan, qasê pirsgirêkên çavkanî girtî ji tund û tûjiya fizikî dijî jinan û rewşa karkirina jinan bi hev re pêwendî hene û tund û tûji dijî wan jinênu ku kar dikin bi nîsbet kêmter e. Ji aliyeke din azardana hevjinan piranî ji aliye wan kesen ku xwediyê xwendina di astekî bilind de ne tê xuya kirin. 90 ji sedê ya goriyan, 3 yan 4 caran pitir dikevine ber tund û tûjiya fizikî ya mîrên xwe.

Jêder: Malpera irwomen.com

Zêdebûna hilatina keçan û azardana zarokan li Ehwazê



Saziya Jinên Iranê: Pirsgirêkên civakî, hilatina keçan û azardana zarokan li Ehwazê de zêde dibe. Li gor gotinêna Sara Çarosayî, karnasê karê jinan li Xozistanê, pirsgirêkên navçeyî, qewmî û Eşîretî û nezanebûna malbatênd derdorêñ bajarê Ehwazê bûye sedema jêhelçûna wan arîşane.

Pejirandina hukma ïdamê ji bo kurekî 16 salî

Li gor rapora nûçegihana Fars, hukmê ïdamê ji bo nûciwanenê 16 salî ku bi guneha kuştina hevalê xwe hatiye girtin, ji aliye daghehê ve hate pejirandin. Ew kure di gotinêna xwe yên dawiyê da xuya kir ku merema wî kuştina hevalê xwe nebûye, ew kuştine bêdestî bûye.

Belengazî di Iranê de

Li gor serhjmêriyên vê dawiyê yên belv bûyî ji aliye Banka Cîhanî ve, yek Milyon û çar sed hezar kes li Iranê jiyana xwe ya rojane bi dahateke kêmter ji yek Dolarî birêve dibin. Banka Cîhanî di rapora xwe ya dawiyê de derheq rewşa belengazî di cîhanê de ragihand: %21 ji xelkê cîhanê jiyana xwe ya rojane bi dahatêk kêmter ji yek Dolarî birêve dibin ku di vê navberê de welatêñ Newala Afriqayê di pileya yekemîn de ne.

Jêder: Nûçegihana Fars

Zêdebûna zext û givasê dijî jinan



Cemal Kerîmî Rad, Berdevkê Saziya Dadê ya Iranê û wezîre Dad yê pêşniyarkirîyê Ehmedînejad di gotinêna xwe de zêdebûna zext û tepeserkirina dijî jinan bi hêceta li xwe nekirinê ji aliye dewleta Ehmedînejad, rîkareke baş zanî.

Eva di halekê de ye ku piştî hatina Ehmedînejad zext û givasê dijî jinan bi hêceta li xwe nekirinê zêdetir bûye û gelek jin û keç bi guneha li xwe nekirinê têñ binçavkirin.

Jêder: Malpera iranazad.com

Yek ji sê ya xelkê Iranê muitad in



Li gor serhjmêriyan zêdetir ji 20 milyon Iranî tûşî pirsgirêkên çavkanîgirtî ji itiyadê ne. Temenê piraniya wan muitadane di naşa 25-34 saliyê ye û zortirîn madeya bikarhatî ji aliye muitadan ve Tiryak e. Meraqa diwar, pirsgirêkên meraqê, kesayetiya ne civakî û hwd... hinek ji pirsgirêkên wan muitadane ne ku dibe sedema dûrketina wan kesane ji civakê.

Daxuyaniya Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî derheq ïdama zarokan di Iranê de



71 ji sedê ya nûciwanenê Iranê tûşî meraqê ne

Li gor lêkolînen nû ku di Iranê de hatine kirin, %71 ji nûciwanenê Iranê tûşî meraqê bûne, lê di vê navberê de qasê meraqê di keçan de zêdetir e.

Ev lêkolîne dide xuya kirin ku keç du beramberî kuran tûşî vê nexweşiyê bûne. Meraqî heya qasekê tevî rihetiya malbatiya peywendî heye, bi terzekê ku ew nûciwanenê ku ji malbateke belengaz de dijîn, meraqeke tundtir hene.

Jêder: Nûçegihana Sîna

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî bi belavkirina daxuyaniyekê nigeraniya xwe ji îmkana ïdama du nûciwanenê din li Iranê da xuya kirin.

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ragehand ku rejîma Komara İslâmî di heyamê sala rabihurî de aliye kêm 7 nûciwan ku temenê wan jêr 18 saliyê de bûne, ïdam kiriye û niha 2 nûciwanenê 16 û 17 salî bi navêñ **Mistefa û Sîna** ji li benda ïdamê ne.

Berpirsiyareke Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî derheq ïdama nûciwanenê bin temenê 18 saliyê ji aliye rejîmê got: Binpêkirina yasayêñ navneteweyî yên dijî ïdama zaroken jêr 18 saliyê ji aliye rejîma Komara İslâmî ya Iranê ve, cihe nigeraniyê ye.

Ez Jijo me, Jijo... Hiih! Ez dizanım ku te ji niha de, ji gotina min a pêşî de, henekê xwe bi min kir... Ez dizanım ku tu dê li cem xwe bibêjî, "Hela ji xwe re li vî jîjoyê geni binêre, bê dengê xwe çawa qibe dike. Bê xwe çawa qure dike." Ma ne weha ye? Teva ku min hîn tiştek ji negoziye, tu wecê xwe hebûsî dikî û birûska xwe diqermiçinî. Ji te heye ku ez ji tiştek ji re nabim. Ez heywanekî piçûk, bihistirî û ne xwedî tu xisûsiyet im. Tu feydeya min ji li însanan tune ye, ne weha? Goştê min ji nayê xwarin, ne? Lî ne weha ye, hinek bêbav hene ku ew goştê min dixwin. Him ji bi ci eziyetê ew min dikujin û çermê min diguron. Min dikin wek pîvazterkê û diavêjin ser agir. Kizînji canê min tê, lê ew li dorê didin lotikan. Hovên heram!

Pîrî pîrî ji zarokan li min dieliminin û di tariya şevê de, bi elektrîka destan li dû min digerin. Ji ber ku ew dizanın ne ji mecbûrî be, ez bi rojê dernakevîm derve. Ew min di quncikekê ya ji di nav çaviyekê de asê dîkin û li benda min dimînin ku ez serê xwe ji qêlik derxînim. Ez ji xwe kerr dikim û hetanî ew li ser serê min bin, ez serê xwe dernaxim. Ew nevîrin rahêlin min, ji ber ku ew dizanın histiriyen min dê di desten wan ên teze de herin û ew dê agir bi canê wan bixe.

Sûcê wan tune ye... Sûcê dê û bavên wan e. Xeta xwar ji gayê pîr de ye. Wan her tim ji zarokên xwe re gotiye, "Kalikê me tê ji geşte, barek histiri li pişte". Ew dibêjin qey ez û histiriyen min bi kêrî tiştekî nayen. Halbikî ew bi xwe ji dizanın û gelek caran dengê wan dikeve kerika guhê min ku ji zarokên xwe re qala min dikin. Ew dibêjin, "Hûn dizanın ku Jijo dikare maran bikuje?" Hemû zarok bi hev re dipirsin, "Naâaa, çawa?" Ew bi heycaneke nedîti ji wan re dibêjin, "Gava ku mar ber bi wî ve dihere û dixwaze bi wî vede, ew xwe dikîşîne qalikê xwe û wexta mar nagihêje mexseda xwe û di wî re dibihure, ew xwe dadide dêla marî. Mar xwe diperpitîne. Her ku ew xwe gîzgîlok dike û xwe bi vir de û wê de dide, li sîxîkên Jîjoyî dikeve û Jijo ji heta ku ruh di bedena marî de hebe, wî bernade."

Ez hîn di wê tasewasa dengê wan de me û di wexteke ku ez bi bêdengiya wan dixapim de, ez serê xwe hêdîka ji qalikê xwe derdixim. Wê çaxê ew wê şûjina ku di ser serê min re sekinandiye, bi awayekî bêûcaxî di bêvila min de radikin û di erdê de diçikînin. Ez bê çare dimînim û di nav desten wan ên qırşîki de bêtaqet dibim. Ew wê kêra kalanî didin ser hustuyê min û lê disütin. Gava ew çav li wê piça xwînê dikevin ku ji min dihere, tu namîne ku ew bibizdin, lê weke kafirek an dijmînekî xwe -yê ku mezinîn wan ji wan re qal kiriye-kuştibe, serfiraz dibin.

Hela bê hûn ci ji goştê min fahm dikin. Temama wî tuxtek e û ji xwe bîhna axê jê tê. Ew zarokên ku carekê dixwin, nema careke din li seyda me digerin. Ew fahm dikin ku mezinîn wan derew li wan kiriye ku digot, "Goştê wî giş dûv e û bi ekil e..." Ma her deren min dûv be dê ci jê derkeve,

Jijo

Enwer Karahan

Ew bi xwe nevîrin min bikujin û goştê min têxin beroşa xwe, ji ber ew dizanın ku xelk û alem dê henekên xwe bi wan bikin û ew dê bibêjin, "Ma mirov goştê **Jûjîyî** dixwe?!"

Hûn ji xwe re bala xwe bidinê, ew nizanın navê min ji seras bikin. Her Kurdek, ji xwe re navekî li min dîkin. Bi tenê di zaravayê wan yê Kurmancî de, ew nêzîkî deh navan li min dîkin. Yê dibêje, "Jijo", yê dibêje, "Juji", yê dibêje, "Jûjî, Jijo, Jijû..." Û nizanîm ci, nizanîm ci... De ifcar bê bi Soranî, Hewramî û Dimîlî ci dibêjin. Ew, êdi Xwedê dizane. Ev Kurd ji qewmekî ecêb



in, ha! Ew hîn li ser gotina navê min li hey nakin, de ifcar ew dê çawa li ser meseleyen giran li hev bikin? Ji xêndi wan ji hin kesen din hene ku neheqiyen weha li me dikin. Bi pirayî ji ew ên ku ji ometa Mihemedî ne. Xelkên din bêtir qîmeta me dizanîn, me li ser serê xwe datinîn. Di eslê xwe de, vî qewmî ji berê xatirê me zanibû. Heta, wan em kirine mijara hedîsen xwe ji. Lî ji ber ku xwendina vî qewmî kêm bû, em ji û xisûsiyeten me ji hatin ji bîr kirin. Nema kesi di civatan de qala hedîsan ji kir. Wexta qala hedîsan nebû, helbet qala me ji nebû. Rehma Xwedê lê be, Mele Nezîrê Dêrikî li kijan civatê bûya, wî qala hedîsa Hezretî Silêmanê nemir dikir ku wî li ser pêşniyara Mirê me ava heyatê venexwar û însaneti ji rezaletiyekê xelas kir. Helbet tu kes bi xisûsiyeten me ya aqlmendiyê nizane. Hûn ji bi heq in. Ma kî dikare texmîn bike ku Jîjoyekî weha hûrik i, pîsik i, bihistirî karibe tişten biaqil bike. Bi Qurana ku we imana xwe pê anîye,

Hezretê Silêman ji di destpêkê de nola we difikirî û ji wî hebû ku em bi kêrî tişteki nayen. Wî bi zimanê hemû tebayan ji zanibû û gava wî meclîsa xwe kom dikir da biryarekê bîde, wî kumê me bi pênc pereyan nedîhesiband û qîmet dida wan heywanen mezîn ên xwînxwar û hov û bêbext. Ji wî hebû ku ew heywanen hanê bi qasî qawet û hovîtiya xwe, biaqil in. Lî di serê dawiyê de wî hînîren me dîtin û bi ya Mîrê me kir. Heger ne Mîrê me bûya, wî dê bi ya wan heywanen beradayî bikira û ew dê rezil bûya. Ji ber ku wî berê xatirê me negirtibû, Mîrê me ji wê carê xwe giran kiriye û wî kî ji şandiye pê Mîrî, ew neçûye. Heta ku apê kûcik çûye.

Gava wî Mîr biriye hizûra xwe, berî ku Mîr raya xwe bibêje, Hezretî ew kişandiye tahqîqatê. Çaxa Mîr xwe piçekî aciz kiriye ji Hezretî birûska xwe germeçandîye û bi Mîrî re xeyidiye. Mîrî her du desten xwe li pêsiya xwe dane ser hev û hustuyê xwe xwar kiriye. Hezretî dev ji ya xwe ber nedaye û gotiye, "Jîjoyê piştbihistirî, ka bibêje! Ma tu xwe ci dihesibîni ku ez kî dişnim pê te tu nayê hizûra min? Xuya ye ku tu pir ketiyî çav xwe, hîli?!" Mîrî di ber xwe de gotiye, "Estexfûrelah ez benî, ma ez ci me ku ez di çav xwe kevim. Ez rebenekî dera hanê me..." Hezret li ser textê xwe ediliye û kef bi ser devê wî ketiye û gotiye, "Na, na, ne weha ye! Min hemû heywan û teba şandin pê te, lê tu nehatî. Min heta bi Hesp ji şand pê te ku ew sultanê heywanan e, tu teva wî ji nehatî û tu di serê dawiyê de bi Kûcikî re hatî. Ka bibêje, bê sedema vê yeka hanê ci ye ku tu teva kûcikî hatî?" Mîrî disa hustuyê xwe xwar kiriye û gotiye, "Ya Pêxemberê Xwedê, ma ez hatime ku tu pirsekî ji min bikî, an min têxişîşintaqê?" Hezret aciz bûye û Mîrî zanibûye ku ci ji bibêje, dê Hezret lê guhdarî neke. Hezret rabûye ser xwe û çoyê xwe li erdê xistliye û gotiye, "Kuro, hey kenifeyê heram, ka tu berê bersiva min bide û quretiyan neke!" Mîr muxdarekî bê deng maye û culhetê xwe kom kiriye:

- Ez xulam, ev tişten ku ez dê bibêjim dikare ne bi dilê te bin, lê madem ku tu dixwazî ez dê bibêjim.

Hezretî pala xwe daye textê xwe û gotiye:

- Bibêje, bibêje! Bê ci di bin zimanê te de ye, bibêje!

- Sedema ku ez bi Teyr û tebayen din re nehatim, ji xwe hewce naake ku ez qal bikim. Min li cem xwe digot ku çawa be wî biryara xwe daye û ez ci ji bibêjim dê wê biryare neguhere, loma ji kî hat, min ji wan re got, "Ma hema ev biryar li ser raya min maye? Ya min ci, ez nayem." Lî meseleya Hesp û Kûcikî, ew tiştekî din e... Binêre, mîrê min. Te Hesp kiriye sultanê mî hemûyan û tu ji û hemû mirov ji qîmeteke mezîn didin wî. Hûn wî dişon, vedişon, qesawî dikin. Hûn wî bi ka û ceh, bi gêzer û xurmeyan xwedî dikin. Hûn wî ji germê û sermayê diparêzin, bi rişim û mitreh dikin. Hûn li ser pişta wî siwar dibin û ew di bin we de dibe teyr. Ji we heye ku malê dînyayê hemû yê we ye. Helbet ew ji xweşiyek e, dibe ku li ser pişta wî li gelek

kesan xweş jî tê. Divêt ku hin pirek li hespê tazî jî siwar dibin û divêt ku hin kes fantaziyên xwe bi pêşdetir dibin ku li ser pişta wî ya tazî tiştekî jî bi hev dikin. Hûn pê diherin qada şerî û ew di bin we de dibe Duldul, ew dibe ba ûbabîsok, lê gava hûn di rîyekê re herin û dujminê we têkeve pêşîya wê, we li ser pişta wî bikuje û ew bi xwe li wî hespî siwar bibe, ew di bin we de çawa diçû, di bin we de ci hêz û xweşî dida we, ew dê eynî xweşîye bide dijminê we jî. Ew dê ji wî re nebêje, "na" û ew ê di bin wî jî de bide çargavê.

Lê kûcik? Hûn ê goşt bixwin, hestiyên xwe bavêjin ber wî. Hûn dê nanê nerm bixwin û yê hişk bibe ya jî kufiki bibe, bavêjin ber wî. Hûn, ne wî dişon û ne jî vedişon. Heger neyê hesabê we, hûn dê pê li hustuyê wî bikin û yekcarinan jî bi keviran bera wî bidin. Heger şez têkevin wî, hûn alîkariya wî nakin ku ew ji wî ezabî jî xelas bibe. Hûn Zivistanê wî li ber ba û baranê dihêlin û ew li ser berfê dirazê. Heger hûn di vî deriyî re bera wî bidin, ew dê here li ber deriyê we yê paşiyê bisekine û ew dê te jî diz û keleşan, jî dost û dijminan biparêze. Ji ber ku ew heywanekî sadiq e, loma ez bi Hespî re nehatim, ez bi apê kûcikî re hatim.

De Mîrî ew Pêxemberê Xwedê bi wan gotinê xwe li ser textê wî mest kiriye, ew bûye kurkurk. Gotinê Mîrî ketine serê wî û ew poşman bûye ku wî heta wê rojê em bi tiştekî nehesibandine. Wî hertim guh daye wan heywanen senek ên derewîn ku karê wan paşgotinî û zema alamê ye. Wî ew şêrê qulbiçûk yê sercimcimî jî kiriye serkana heywanan. Wî ew qaweta hanê daye wî bêbavê piligî ku feqîra xezalê di nav lepê wî de dibe mina zarokeke ji terefê bavê xwe ve bê tecawiz kirin.

Mîrî kiriye ku ew nikaribe ji cihê xwe tev bilive û bi zorê permekê bide xwe û bibêje:

- Kuro Jîjo, ev gotinê te, gotinê aqilmendant in, haa! Kuro bi qesema navê Xwedê, min nizanîbû ku tu ew qasî biaqil î.

Mîrî jî xwe heta bi belika guhan nepixandiye û gotiye:

- Estexfûrelah, Ya Hezret. Ma ez ci me ku aqilmendiyê bikim. Ez jî ji xwe re tewtewetiyen dikim, ma hedê min e ku ez aqil bidim te.

Wî serê xwe hejandiye, lê ew teviziye. Destêr wî li paş wî bûne û ew di orta cimeetê de çûye wî serî û hatiye vî serî. Ew hatiye di ser serê Mîrî re sekiniye û midetekî ji jori de, lê temaşe kiriye. Wî ji serî û heta bi binî Mîr ji nuh de keşif kiriye. Bi wî re miziciye û destê xwe di riha xwe de daye. Nûr jê hatiye xwarê. Serê xwe rakiriye, li esman nêriye. Destêr xwe ber bi Xwedê ve kirine û gotiye:

- Ya Rebî! Ez bi qurbana nexşen te bim ku te li van mexlûqen xwe ên reben kiriye.

Ü destêr xwe bera ber xwe dane. Hemû heywan, teyr û teba, bêdeng bûne. Deng ji kesî jî nehatiye. Heta, Botbotik jî li ser qûna xwe rûniştiye û li wan temaşe kiriye. Hezret vegeriyaye ser Mîrî û gotiye:

- Ma tu ci dibêjî Jîjo, ev ava heyatê ku ji terefê Xwedê Teala ve ji min re hatiye şandin, ez vexwim, ya na?

Her kesî bi meraq li Mîrî temaşe kiriye, bê ew dê ci bibêje.

Mîrî gotiye:

- Ma hema li ser raya min maye ku tu dê vexwî, an venexwî?

Wî gotiye:

- Her kesek xwedîyê raya xwe ye, Jîjo! Tu jî ya xwe bibêje!

Mîrî meraq kiriye ku kesekî mixalefeta vexwarinê kiriye, ya na. Pişti wî fahm kiriye ku her kesî gotiye, "vexwe", wî destêr xwe dane ser hev û gotiye:

- Venexwe!...

- Çima Jîjo?

- Heger tu vê avê vexwî, tu dê ebedî li dînyayê bimînî. Tu dê yextiyar bibî. Tu dê di bin xwe de birî û bimîzî. Xelk û alem dê berê xwe ji ber te biguherin. Ya baş ew e ku mirov di cihê şérîn de here ser heqîya xwe, bêyî ku têkeve ber dest û lingan.

Ew fikiriye. Mîrî careke din jî ew bi sed tirrî deyhndar derxistiye ku wî heta wê gavê ew nekiriye şûna zilaman. Wî berê xwe daye wan heywanen ahmeq ên debdebe û gotiye:

- Ez bi navê Xaliqê jorîn dikim ku ev Jîjo bi heq e. Xebera wî ye û ez vê avê venaxwim ku ebedî li vê dînyayê bimînim û mezinatîyê li we ahmeqan bikim. Bila yekî din bê û heger qaweta wî heye, bila ew zimanê we hemyan fêr bibe.

De îcar we dît, bê kerametên me çawa ne? Ez ji sulaleya wî zatê hanê me ku Hezretî Silêman şahê bej û avê, ji gotina wî derneketiye... Divêt ku gelek kesan hetanî niha jî nizanîbû bê Hezretî Silêman ji bona ci ew ava hanê venexwar. De wa ye bi xêra min, bi xêra Jîjoyê pişt bihistirî ew tişte hanê hate eşkere kîrin, ma ev jî ne bes e? Nexwe, ez bi kêrî tiştekî hatim.

KOMA KAMKARAN NAXWAZİN CARÊ BERHEMÊN XWE DÎ ÎRANÊ DE PÊŞKES BİKIN



Koma Muzîkarê Kamkaran (di Farsi de ji wan re Kamkarha tê gotin) yek ji malbatên Kurd li Kurdistana Îranê ne ku ji heft birayan û xwişkekê pêk tê. Koma wan yek ji komên navdar û zanistî yên muzîka Îranê û Kurdistanê tê hesibandin. Karê wan yê bingehîne hunerî ji muzîka Kurdî ya dewlemed û rengareng bi awazên túj û ji ritma muzîka Îranê ya kilasîk pêk tê.

Vê Koma Muzîkvanîyê îsal ilan kiriye ku bi sedema piştgîrî nekirin ji karêwan, ev êdî ci din naxwazin konseran li Îranê bidin û albomên nû biweşînin. Koma Kamkaran ku pêtir ji 5 salan e ci albûmek di hundirê Îranê de pêşkès nekirine, hertim gotine ku di dîroka xebata wan de heta Qiranek û kereke kaxezê alîkarî bi wan re nehatiye kîrin û navendên dewletî ji tenê bi bernameyên propadandayê girîngî û pûteyê didin.

Koma Kamkaran li Kurdistana Îraqê

Di meha çûyi (Gelawêjê) de, Koma Muzîkvanîn Kamkar hatine herêma Kurdistana Îraqê û di hola Mîdyâ ya bajarê Hewlîrê de konsereke mezin dan. Qirar e ku di destpêka heyva Oktobrê de li Madrîd, serbajarê İspaniyayê bi awayekî berfireh karêwan xwe yên hunerî pêşkès bikin. Hoşeng Komkar Serokê koma Muzîkarê komkar got: Em di vê seferê de, kar û berhemên xwe yên nû ku di Îranê de nehêlane em wan bidin weşandin yan piştgîriya wan nekirin, ji aliyê Kompaniya Çarçera ya Hewlîrê ve dê biweşînin û pêşkès bikin.

Orkestera Senfonîk ya Malmo li Swêdê, di 5'ê Oktobra 2005'an de li konsera xwe ya mezin ji berhem û muzîkvanîn kamkar mifahê werdigire û mîvandariya wan dê bike.

Kar û xebatê muzîkariya vê koma hunerî ya Kurd bala gelek hunermendêñ cîhanê bo aliyê xwe kişandîye. Lê belê em dibînîn di bin siya desthilatdariya reşperest û dijî hunerê de, ev koma han neçar dimîne kar û berhemên xwe li derveyî Îranê de pêşkès bike.

HEZKIRIN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Hezkirin, her çendî ku xwediyê wateyeke ferhengî û civakî be jî, wekî dijwateya nifrîn, kift û kerexeyiya derûnî; çeqa hest, helwest û dilîniyeke mirovî tê zanîn. Her mirovek meyl û bala xwe dide ser hezkirinekê. Û her mirov bi hezkirinekê re dijî û pê mijûl û eware dibe.

Peywir û pêwendîya hezkirinê, bi giranî li ser hunermend, ramanwer û rewşenbirêne pejñkar dimîne. Belê mirov gelek caran dibîne ku zanyarêne dinê ji vê peywir û vatiniyê dûr dimînin û bi sistî û pistî tevdigerin.


Hiş û hişmendiya mirov a ku bi saya pênc sehekîyên mirovî heyînên dinê dihishisine, zêde nîrxê nade hêza hezkirinê. Heta gelek caran wê di ser guhê xwe re diavêje. Hin caran hê pêstir diçe û hezkirinê wekî hesteke têkel, demdemî û xapînok dibîne. Her wekî din jî hezkirinê gelek caran wekî efyona hişê mirov, tewşik û peşikandineke mengîwer, an jî dek û dolabêne derezanistî tê bi nav dike. Ji bo wê ye ku mirovên xwediyê vê raman û hişmendiyê ango gelek ronakbîr û zanyarêne dinê li ser vê mijarê serê xwe naêşînin û bêdeng dimînin. Hin ji wan jî, wê wekî rastînoyekê dibînin belê, zêde guh nadenê. Û hin jê jî wê wekî tiştekî bêfêde, bêwate û fentezî didin wesfandin.

Cehd, koşan û hewldanênu ku bi mebesta hezkirinê têne kirin û her wiha lebk, lebat û xebatênu di riya hezkirinê de têne bikaranîn, bêşik ne tiştên asan û lasayî ne. Dibe ku eleqe û têkiliya ku bi hezkirinê re tê danin, ji bo hin kesan bi qasî daketina bîreke(çaleke) kûr a bêbinî xeternak were dîtin. Û heta dibe ku ji hêla hin mirovan ve, bi qasî ku mirov nikaribe nêzîkî wê bibe, erjeng û tırsnak jî bête pejirandin. Belê ligel her tişti, sersarkirî û xemsariya civaknas, mirovperwer û ramanweren dinê ya li hember vê babetê, li aliyekî çîminjeyî, keslaneyî û tiroleyiye; û li aliyê din jî pêkenî, seyr û sosretî ye.

Çi takekes dibe ci jî civak, ci jin dibe ci jî mîr, ci biçûk dibe, ci jî mezin... berê ku mirov bi hezkirinê mijûl û têkildar bibin, divê wateya wê ya rastîn baş bizanibin. Belê wekî ku li jorê jî hate diyarkirin, ev yek qet ne tiştekî hêsa ye. Û wate, nirx û girîngiya hezkirinê bi çend peyv, gotin û vegotanînen manîdar jî nayê sînordarkirin. Lewre hezkirin ne hin tişt e. Ew, gelek tişt, heta her tişt e.

Wateya hezkirinê, ne di tu vegotin û navandinê sînordar de bi cih dibe û ne jî di ferhneg û pirtûkên stûr de tê hilandin Tenê ne hezkirin jî; tu hest û dilîniyêne derûnî, nayê ravekirin û watedarkirin. Têne jiyin û hîshisandin. Hezkirin, nefrîn, rîzgirtin, kerb, kîn, keser, şahî, xemgînî û hwd... hemû wekî bertek, vebizav û reaksiyonâ hewisina dilîniyêne derûnî têne zanîn û nasandin. Û mirov nikare van hestan di nava qalib û qewareyê teng de biesirîne an jî bifetisine. Ji xwe tiştên ku tu car nayê tepisandin yek jê fîkr û ramana mirov a ku ji hişmendiya wî/wê dinime ye. Û ya din jî hest û dilîniyêne wî/wê yê serbest û azad in.

Hezkirin, dilîniyeke azad e. Tu sînor, kelem û astengiyan nahebîne. Tu bêdilî, bêxêri û bêdedebyan naecibîne. Tu durûtî, koneti û bêrêtiyan nepejirîne. Nayê çewsandin, melisandin û tepisandin. Nayê qedexekirin, manîkirin û hemandin. Nayê mandelekirin, windakirin û tunekirin... Ew, bi mirov re peyde dibe; bi mirov re dijî û bi mirov re bi dawî dibe. Hezkirin Di her hilim, çirke, xulke û gavê de veşartî ye. Li her deriyî dide û di her bîhurî re derbas dibe. Li her cih û her warî peyde dibe. Li her qadê dihewe. Bi xwe re li hev e. Û bi hemû hest û dilîniyêne hemberê xwe re jî... Ango hezkirin ne di hundirê mirov de ye; berevajî wê, mirov di hundirê hezkirinê de ye.



Ne pêdiviya mirov bi hezkirinê heye û ne jî ya hezkirinê bi mirov heye. Çimkî ew, hesteke erêni û xwezayı ye. Belê tiştê ku pêdivî pê heye zanîn û zanyariya hezkirinê ye. Bi vegotineke asantîr û vekirîtir, pêdivî bi zanebûna jixwehezkirin, jêhezkirin û jihevhezkirineke rastîn heye. Yanê her kes ji hezkirinê hez dike; belê tu kes zêde nizane ji hevdû hez bike. Pirsgirêk jî ev e. Bonimûne; dayik gava ku bi zarokê/a xwe şâ dibe, ji nezanî (hin caran jî bi zaneyî) wî/wê gez dike û wî/wê bi girî vedike. Bêawarte, her kes vê yekê wekî hezkirinê bi nav dike û dipejirîne. Bi ya min be na; lewre hezkirin, ne êşandin û bêzarkirin e. Hezkirin aramî, şabûn û şadîbûna hevpar a dualî ye. Em li vir dibînin ku ne zarok bi wê şabûnê şâ dibe û ne jî dayik bi wî girîyi dilxweş û aram dibe. Bêguman dayik bi niyet û armanca hezkirinê vê yekê dike; belê encam ne li gorî dilê tu kesi ye. Li vir kemasî ci ye? Kemasî ne hezkirin û nehezkirin e. Ne gezkirin û êşandin e jî. Kemasîya mezin, zanebûna hezkirinê ye. Ku dayik bizanibe ji zarokê/a xwe hez bike, dê encam erêni be. Û dê wê çaxê, dayik û zarok bi hev şâ bin û li hev bin.

Pêkan e ku mirov ji bo hemû mirovên din jî wekî nimûne heman minakê bide. Belê divê baş bê zanîn ku hemû cureyên hezkirinê, hewceyî bi zanîn û zanebûna hezkirinê heye. Ji bo wê jî, divê beriya her tişti em bizanibin ji hevdî hez bikin; hezkirinê hem bitehmînin û hem jî bidin tehmandin.

Emê nivîsara xwe bi gotina "Eric Fromm" a xweş û manîdar bi dawî bikin: "Mirov dibêjin qey ji hezkirinê hêsatir tiştek nîn e. Nexwe, behreya hezkirinê bi her kesi/ê re heye; belê a girîng zanebûn û sepandina wê ye."

Roman û Ewropa

Milan Kondera

Wergeran ji Farsî: Emîr Şuaîvend (Beşa 2)



Hevdem teví jar bûna desthilatê, Xwedê bi ser cîhana ku nîzama "Erziî" ya wê birêve dibir, rindî û xirabî ji hev paqij dikir û bi her tiştî wateyek dida, Don Kîşot jî ji koşka xwe hate der û kete hundirê cîhanekê ku êdî ev cîhan nedinasî. Bi bê hebûna dadwerek yan jî bîryarekî yekcarî, cîhanê dem li dest keşekî bi sam girte xwe. Ev take rastiya pîroz bi ser hezaran rastiyêñ hevpar di nava mirovan de bîhirî. Destpêka serdemê nû eva bû û hevsû tev wê, roman, ango mînak û rûçika vê cîhanê hate zayîn. Ger ku em ji ramanê Dekart wekî pêkhateyekî gişt alî binérin û bi tenê di hember cîhanê de bisekiniñ, em dê xwe di rewşekê de bibînin ku Hêgêl bi heq ev yek lehengane binav dikir.

Ger ku em weke Serwants, ji cîhanê re rîjeyî bifikirin û xwe di hember nek rastiyekî berteng û yek alî, belkî xwe pêşberî komek ji rastiyêñ newekhev bibînin (ku her yek ji wan di ramanekî fantezî, bi navê kesayetiyeke tê berçavan) û eger em vebirînê weke raza nebûna vebirînê bizanîn, helwesta me her bi wî qasî helwestekî pêş lehengane ye.

Heq bi kî ye û neheq kîjan e? Don Kîşot yan yên din? Di vî warî de pir hatiye nîvisandin. Hin kes romana Serwants bi rexneya fêmoxwazane û îdealîzmekî sergêjbûyî di Don Kîşot de dizanin. Hin kes jî vê çendê di hêybet û bilindkirina ev îdealîzma han dizanin. Her du rave jî şas in, ji ber ku ew rehêne romanê ne weke pîrsiyarekî, belkî wekî berevanekî sincî dihesibînin.

Mirov xwazyarê cîhanekê ye ku tê de rind û xerab bi eşkere ji hev paqij bin. Hezkirina zatî ya mirovan bi berevaniyê, zaftir ji têgihiştina mirovan e. Ol û îdeolojî her li ser vê xwastikê qahîm dimînin. Tenê rîya ku mirov dikare bi ramanê re pêk were eva ye ku mirov ziman û naveroka romanê bi tewawî biperjîne. Lî gereke ew bizanibin heq bi kî ye. Yan Anakarniya goriyê zalimekî dilreq e yan Karnîn goriyê jinekî bêexlaq e, yan jî "K"1 di dadgehekî neadilane de bêguneh tê nasîn, gelo ew bêguneh bû yan jî dadgeh wêneyek ji edaleta pîroz bû û K gunehbar bû.

Ramanek ku li ser hîmî mercen ew yan ev hatibe ava kirin nikare bersivderê sereke yê pîrsen mirovî be û herweha nebûna bîryarekî yekcarî napejirîne ev bêhêziya han tê wateya vê çendê

ku fêmkirin û pejirandina hikmeta romanê karekî pir estem e.

Don Kîşot kar û bizavêne xwe di cîhanekî yekser vala û bêdawî de dest pê kir. Wî dikarî di rewşa xwe ya derveyî bimîne yan jî vegere malê. Di wî serdemê seretayî de hemû roman seferekî xuya bo cîhanekî bêdawî bûn. Bo mînak, di rûpela yekem ya pirtûka Jak Qedergira, berhemê Dîdro, Jak û erbabê xwe di seferê de ne. Em nizanîn ew li ku hatine û kur de diçin. Ev du kesayetî di serdemekê de dijîn ku destpêk û encama vê tune ye, ev di keşekî bêdawî de ne, Ev di hembêza Ewropayekê de ne ku heta heta ye dê li ser pîyêñ xwe bimîne.

Piştî nîv sedsalekê, di berhemê Balzak de asoyen dûr yên Dîdro winda bûn, rast weke dîmenekê ku heta heta li pişt apartemanen modern yên civakî weke yên Polîs û Artêşê winda bû. Berevajî serdemê Servantes û Dîdro, vê carê êdî dem bi kêfxweşî nedibihurî, belkî li ser rîya asin(rêyl) ya dîrokê diherikî. Mirov bi hêsanî dikare siwari vê rîyîl be, lê nehatine xwara wê gelek hêsan nine. Di rastî de jî hêj vê rîyîl dîmenekî bi xof negirtiye xwe, bigre ev xweşik jî tê berçavan; hatiye garantî kirin ku mosafirên li ser wê rîyîl, wan destan û biserhatan dê bibînin û di dawiya xet de dê navnîşanan jî werbigrin.


Kêmek piştî wê, aso ji bo Êma Borarî Flobr hê bertengtir dibe û weke qefesekê xwe derdixe. Biserahat li wî berê xet de ne û heza gîhiştin bi wan nahê hebandin. Xew û zîndî xew bêzariya jiyana rojane ji nav dibin. Bêdawîti û berfirehtiya ji dest cûyî ya cîhana derveyî cihê xwe daye berînî û firehiya riha mirovan. Bi wî rengî bû ku tîrsa mezin ya zal bi ser takekes û bîsedemiya takî- ku yek ji şîrîntirîn tîrsen Ewropayı ye- pişkivî.

Lê di demekê de ku dîrok (yan jî eva ku di rengê hêzekî ban mirovî ya civakekî gelek bîhêz de dimîne) di encam de mirovan di çengen xwe de digre, xewna firehî û bêdawî bûna rihê jî rengê xwe yê efsonî (cadoyî) ji dest dide. Dîrok êdî bala kesê bi bang û mîzgîniya şanazî û mîdal danê nakişîne; heyâ ku tenê qasgirtinekî jî bi kêmî dispêre kesekekî. Di hember dadgeh û qesrê ci karek ji destê "K" tê? Karekî wisan ji destê wî nayê. Gelo ev her nikare mînanî madam Boarî xewnan jî bibîne? Na vê carê telî gelek bi sam û xof e û hemû hest û ramanê xwe hûd dike. Ev tenê dikare bi dadgeh û karê xwe yê pîvanê (qasgirtinê) bifikire. Riha wî ya fireh û bêdawî ger zemanekî hebû, niha ev tiştek nine ji xêncî tiştekî bêbar û ber.

1: Lehengê romana navdar ya Kafka- M

XACEPIRS

A: Emir Şuawend



Çeprast:

- Dengê xweşiyê ku jin diqîrin- Parek ji çekê ye
- Navekî Kurdî- Meger- Kal
- Temen- Hevza avê- İşare bi zayenda mî
- Nebz
- Dişa diya mirov- Pêtir taybet bi keçan e
- Vê carê- Feqet
- Di siyasetê de ajavegêr
- Mayeya jiyanê ye- Di Turkî de çêl- Di rêza alfabeşa
- Kurdî de peyva navîn
- Ehlî kirin- Derd- Kevirê qît
- Ereb nine- Xîştek e ku ji bo xemilandina dîwaran bi kar tê

Serjêr:

- Ji malbata Seyan e- Qonaxa pêş zewacê
- Di Turkî de du- Pezê mî- Mentiq
- Dengek ku di dengbêjiyê de gelek bi kar tê- Paranewe- Min û te
- Petû
- Mang- Di zaravê Hewramanî de işare bi cinsê mî
- Navê welitekê ku para duyem ji navê wê antîn e- Tarîtîrîn reng
- Di zaravê Soranî de keç
- Ew û babê min ji babekê ne- Helbestvanekî Kurd- Li ku derê ye?
- Kûrahî- Ger wiha ye- Hingiv saz dike
- Musbet- Xêncî

FESTİVALA SİRUDA KURDÎ YA "BÜKE BARANE" LI ŞÊRWANA XORASANÊ


Yekemîn Festîvala Sîrûda Kurdî ya **Bûke Barane**, roja sêsemî 26.07.2005'an li Şêrwana Xorasanê hate lidarxistin.

Di vê Festîvalê de 6 Komên Sîrûdê yên **Arman, Arif, Diyar, Durne û Şahê Cihanê** ku ji 100 hunermendêñ Kurd pêk hatibûn, bername û berhemêñ xwe pêşkêş kirin.

Herwiha Koma Sîrûda "**Bûke Barane**" bi rêveberiya Ezîzula Refeti ku ji 40 xwendekarêñ Kurd yên Şêwanê pêk hatibûn, sîrûdêñ herêma Şêwanê wekî: **Kurmanc Ziman, Kurmanc Perçem û Kurmanc Namûsa Min** pêşkêş kirin.

Bajarê 16000 kesî yê Şêwanê ku piraniya rûniştvanêñ wê ji Kurmancan pêk tê, bingeh û çavkaniya muzîka Folklor û Miqamêñ Kurdî ye û gundê Xanlıq ya vî bajarı wekî navenda hunera muzîka Kurdî ya wê herêmê tê naskirin.

Bersîva hejmar 21





Sêyemîn Kongreya Yekîtiya Ciwanê Demokrat ya Kurdistana Îranê

Di bin dirûşma Di pêxema piştgirî kirin ji xebata azadîxwazare ya Ciwanên Kurd ji bo dijberî tevî rejîma diktatorî di Îranê de, Sêyemîn Kongreya YCDK Îranê seet 5:30'ê sibêdeya roja 22'ê Gelawêja 1384'ê Rojî (13.08.2005) piştî dehan demjimîr karê berdewam dawî bî karê xwe anî.

Roja pêncsemî 20'ê Gelawêjê, Kongreya Sêyem ya YCDK Îranê bi nişandana filmek dukomenetî li ser dîroka Yekîtiya Ciwanan û piştre jî peyama vekirina Kongrê ji aliye birêz Mistefa Merûfi, Sekreterê Berê yê YCDK Îranê û bi besdariya endamên rîberiya PDK Îranê, Kadro û Pêşmergeyên PDK Îranê, endamên YCDK Îranê û komek heval û mîvanên YCDK Îranê dest bi karê xwe kir.

Ji aliye birêz Mistefa Hicri, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ve peyamek hate pêşkêş kirin. Kekê Mistefa pîrozbahya lidarxistina Kongreya Sêyem ji endamên YCDK Îranê kir û bal kişande ser rewşa xirab û nebaş ya ciwanan di bin desthilatdariya Komara İslalmî ya Îranê û herwiha rola



ciwanan wekî hêza bingehîn ya serhildana vê dawiyê yên bajarên Kurdistanê bilind nirxand.

Belavokek bi navê **KONGRE**, Paşgira **Lawan** Organa YCDK Îranê hatibû amade û çap kirin û bi besdaran re hate dayîn.

Di rê û resma vekirina Kongreya Sêyem de gelek peyam hatin xwendin. Desteya Nivîskarêن **Agirî** jî peyamek ji Kongreya Sêyemîn ya YCDK Îranê re şandibû ku di kongreyê de hatibû pêşkêş kirin.

Ji taybetmendiyêner sereke yên Sêyemîn Kongreya YCDK Îranê em dikarin bi kurtî wan xalêñ jêrîn bas bikin: Bilindbûna asta hişyarî û zanebûna endamên kongreyê derheq mijar û babetêñ cuda cuda ku bi eglek evroyî û serdemiyane û di rewseke demokratik û şaristaniyane de li ser babetêñ Kongreyê bîr û rayêñ xwe didan xuya kirin, serxwebûna fikrî, bawerî bi xwe hebûn, pîşniyar û dîtinêñ dewlemend û balkêş ji bo Kongreyê û girîngîdan bi serhildan û tevgera ciwanêñ bajarêñ Kurdistana Îranê û rengvedana wê di bas û qengeşyan de û hwd....

Em serekvtina Sêyemîn Kongreya YCDK Îranê ji wan pîroz dîkin.

Amerîka: Serkutkirina Kurdan ji aliye dewleta Îranê ve cihê nigeranyê ye

Wezareta Karê Derve ya Dewletêñ Yekbûyi yên Amerîkayê dibêje ew raporênu bas ji serkut û چewsandina Kurdêñ Îranê ji aliye dewleta



Îranê ve dîkin, cihê nigeranyê ne.

Berdevkê Wezareta Karê Derve dibêje rapor wisan didin xuya kirin ku li Bakur û Başûrê Rojavaya Îranê çend kes hatine kuştin û hejmareke zaf jî hatine giritin. Ev berdevk dibêje haşa û înkarkirina ji mafêñ kîmaniyan pirsek e ku Rêxistinê Navneteweyî bi piştgirêdan bi belge û dukomentên bê hejmar selimandine.

Wezareta Karê Derve ya Amerîka ji Îranê daxwaz kirîye ku nerm bilive û rîz ji mafêñ hemû xelkê Îranê bigire. Ew raporênu ku heftiya çûyî ji Kurdistanê gîhiştine, bas ji vê çendê dîkin ku di pevçûnê navbera xelkê û Polis li bajarê Seqizê de 13 kes ji neraziyan jiyan xwe ji dest dane.

Kuştina xebatkareke çeleng yê Kurd di meha Juiyeyê de bi destê hêzêñ Ewlekarî yên Îranê yê bûye sedema pêkhatina xwepêşandanêñ rîzokî yên berfireh li herêmêñ Kurdistana Îranê, ku di hejmarek ji wan de tund û tûjî derketiye holê.

Jêder: voanews

Amerîka: Çekêñ Îranî di Îraqê de hene

Dewletêñ Yekbûyi yên Amerîkayê dibêje ku çekêñ Îranî di Îraqê de hatine peyda kirin. Danald Ramsfield, Wezirê Parastina Amerîkayê got ku ev çekêñ ku di kiryarêñ teroristî û teqînêñ ku di Îraqê de têñ bikaranîn, ji reya tixûbê Îranê bo Îraqê hatine. Ramsfield dewleta Komara İslâmî ya Îranê ji ber rînegirtin ji hatina çekan bo Îraqê û gîhiştina wan bi terorîstan ji reya sinorêñ Îranê bi tundî rexne kir.

Wî da zanîn: Tixûbeke mezin û dirêj di navbera Îranê û Îraqê de heye û eva ku dewleta Îranê pêşîya şandina çekêñ han



ji bo Îraqê nagire, alîkarî nekirina wan tevî cîgîrbûna ewlekîrî û tenahiyê di Îraqê de ye.

Ramsfield tekez kir û got: "Eva pirsgirêk ji bo dewleta Îraqê, hêzêñ Hevalbend, civaka navneteweyî û aqibet pirsgirêk ji bo Îranê ye".

Jêder: BBCpersian û Voanews Malperêñ